# ZAROKA ŞEVÊ

## Jack London



NÛDEM

# ZAROKA ŞEVÊ

## Jack London

**Çîrok**

Werger: **Mustafa Aydogan**

**Weşanên NÛDEM**

Weşanên NÛDEM: 16
Zaroka Şevê
Çapa Yekem: Stockholm 1995

© Mafê kurdiya wê: Weşanên NÛDEM
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Karanî Jamîl,
ji kovara Svensk-Kurdisk Journal
ISBN: 91 88592-16 2

Navnîşan:
Termov. 52 2tr.
175 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

# Naverok


Zaroka Şevê 9

Xwêdana Eniyê 26

Yê Meksîkî 50

# JACK LONDON
(1876 - 1916)

Di dawiya sedsala 19-an û di destpêka sedsala 20-an de, hem li dinyayê û hem jî li Amerîkayê gellek guhertin çêbûn. Mirovatî ji qonaxekê derbasî yeka din dibû. Di pêvajoya vê derbasbûnê de, pêşveçûnên ku di warê teknolojiyê de hatin holê û guhertinan tesîr li têkiliyên mirovan kirin û ji nû ve şikil dan wan, bi gellek awayan hatin zimên. Edebiyat jî li hember van guhertinan nikarîbû laqayt bima. Xwendevan di nava rûpelên berhemên nivîskarên wê demê de, xusûsiyetên wê demê û manzarayên însanên wê demê ji nû ve dijîn.

Jack London jî yek ji wan nivîskarên ku damga xwe li dawiya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an xistine, ye. Belkî nivîskarê herî produktîv û yê ku behsa wî herî bêtir tê kirin, be jî. Di wê demê de, kêm nivîskaran bi qasî wî tesîr li civakê kirine. Li gel ta'ma xwendina nivîsên wî, enteresantbûna jiyana wî jî bala mirov dikşîne. London ne bi tenê di nava xwendevanên edebiyatê de tê nas kirin. Ew miroveki pirralî bû. Di nava hemû alîyên vê pirralîbûna wî de, ji aliyê şiyana nivîsandinê ve ahengeke pirr baş hebû. Lê ji bo naskirina London, lêhûrbûna jiyana wî ya zarokuiyê şert e. Bêî vê yekê, fahmkirina wî û nivîsên wî, dê pirr zehmet be. Ger mirov bibêje; hema hema hemû pirtûkên wî yên edebî, li ser bingehê wan hedîseyên ku ew bûye şahidê wan, an jî yên ku ew bi xwe jiyane, hatine avakirin, dê ne mubalaxe be. Bo numûne di "Xwêdana Eniyê" de xusûsiyetên zaroktiya London bi awakî pirr vekirî xuya dibin. Ji bo ku bibe yê herî xurt, yê herî pêş û yê herî bilind bi awakî nedîtî xebitî. Ji bo xwe di her warî de bi mirovan bide qebûlkirin û mirov li hember van xusûsiyetan serê xwe bitewîne, çi ji destî wî dihat texsîr nedikir. Ev daxwaza û hewildanên ji bo pêkanîna van daxwazan, di jiyana wî de, di danûstendin û helwestên wî yên li hember mirovan de tesîreke gellek mezin kir. Di kîjan grûpê de ba, bila biba, wî hertim dixwest ku ew bibe yê sereke. Ev di pirtûkên wî de, di xusûsiyetên qehremanên wî de, tê dîtin. Ger hûn Londonê ku hertim digot; "Zaroktiya min qet çênebû", Johnnyê "Xwêdana Eniyê" yê ku di kar de nedixwest tu kes bighêjê û qet tu zaroktî nejiya, tîne bîra mirov.

Di pirtûkên wî de heyecaneke mezin heye. Heyecan û hêviyên qehre-

manên pirtûkan, bi zimanê London ê ku diherike û bûyeran bêtir enteresan dike ve xwendevanan bi temamî dixin seha xwe ya magnetîk. Ev xusûsiyet meraqa xwendevanan û heyecana ku di berhemê de heye, tev li hevdû dike. Xwendevanên ku piştî dest bi xwendina pirtûkeke wî dikin, êdî ne bi destên xwe ne. Heta ku pirtûk biqede, nema dikarin dev jê berdin.

Rastiya civakê û protestoya li hember şertên jiyanê, bingeha nivîsên wî bû. Lê wî hemû hêlên vê rastîyê, di bin ronahiya zanyariya edebiyatê de, dianî ba hevdû; heyecan û hîsên xwe tevê dikirê: ew bi hemû şiyana xwe ya hunerî distira; bi îdealên xwe yên pêşerojê ve dihûna û piştî gîhaştina qonaxa yêkîtiya dîyalektîk ya di navbera estetîk û rastiyê de, ji nû ve pêşkêşî civakê dikir. Ji ber vê yekê, London wî cîhê xwe yê ku di dilê xwendevanên edebiyatê de hatibû peydekirin hîn jî diparêze.

Min li jor diyar kir ku London nivîskarekî pirralî bû û di nava vê pirralîbûna wî de ji aliyê şiyana nivîsandinê ve ahengek hebû, lê divê lê bête zêdekirin ku ev aheng di warê fikrî de cîhê xwe ji dijayetiyan re dihêle. Ji ber vê yekê ew nivîskarekî bi şiyan, lê bi paradoksan ve hilmiştî tê dîtin. Li gor gellek lêkolîneran fikrên wî ji tevliheviyeke Marks û Nietzche pêk dihat. Sosyalîzm, neteweperestî, elîtîzm, nîjadperestî... Wî hertim weha digot; " Ez berê sipî mim û dû re sosyalîst im". Vê helwesta wî carinan serê wî dixist belayê jî. Bo numûne; ji nîjada zer nefreteke mezin dikir. Gava li Japonyayê bû, ji ber vê nefreta xwe di munaqeşeyekê de li yekî Japonî dixe û tê girtin. Ger serokê Dewletên Amerîkayê yên Yekbûyî Roosevelt mudaxele nekira, ew ê bi şertê ku divê Japonyayê terk bike jî nehata berdan. Paradoksa di warê fikrî de hebû, bi Şerrê Cîhanê yê yekem re, giraniya xwe da aliyekî. Di Şerrê Cîhanê yê yekem de, hêla wî ya neteweperestî pirr eşkere bû. Wî di vî şerrî de bi awakî neteweperest piştgiriya Amerîkayê kir û dû re jî têkiliyên xwe ji Partiya Sosyalîst birrî. Lê bi paradoksan ve hilmiştîbûna wî, di îstîfanameya wî de jî xuya dibû; wî di îstîfanameya xwe de dîsa prensîpên sosyalîzmê paraztibû.

London di 12.01.1876-an de, li San Fransisco hatiye dinyayê. Ew, berhemê wê têkiliya bi dizî ya dîya xwe (Flora Wellman) û bavê xwe (astrologê Îrlandî William Chaney) bû. Gava hîn ew di zikê dîya xwe de bû, astrologê Îrlandî ji San Fransisco diçe û nema vedigere. Piştî ku Jaek dibe nehmehî, dîya wî bi John London re dizewice. Jack li ba vê malbatê mezin dibe. Ji xwe paşnavê xwe, yanî LONDON jî ji vê malbata zirbavê xwe stendiye.

London xwedî jiyaneke zaroktî ya pirr enteresant bûye. Zaroktîya wî di

feqîriyê de derbas bûye. Ji ber vê yekê jî London di temenekî pirr piçûk de, dest bi jiyana kar kiriye. Wî ji rojname firotinê, ji kovboytîyê, ji lizêrgerînê, ji di fabrîkeyan de karkirinê, ji serserîtiyê û hwd heta di 1904-1905-an de, korrespondentiya herba Rûsya û Japonyayê, tu kar nema ku nekiriye. London gelek celeb mirov nas kir û li gelek jîngehên cûda jiya. Jiyaneke bûyerzengîn û enteressant... Nivîsên wî, li ser vê jiyana bûyerzengîn û enteressant hatin ava kirin û bûn zimanê protestoya li hember neheqiyê... Ji ber vê jî tev paradoksên wî yên di warê fikrî de hebûn jî ew dîsa wek nivîskarê xebatkaran tê nas kirin.

Nivîskariya wî bi saya musabaqeyeke kovara bi navê "San Fransisco Morning Call"ê dest pê dike. London wê gavê 17 salî bû. Bi çîrokeke xwe ya ku li ser bingehê bîranînên deryayê hatibû avakirin, beşdarî wê musabeqeyê dibe û 25 dollarê xelata yekem werdigre. Çîroka wî di 12-ê Mijdara 1893-an de di Callê de tê weşandin. Piştî vê bûyerê, biryara nivîskariyê dide. Çend çîrokên din jî dinivîsîne, lê wê gavê bi sernakeve û hêviyên wî yên di vî warî de hebûn jî qels dibin.

Londonê ku xwe biserneketi dihesiband di nava bêhuzûriyeke mezin de bû, tam di wê navê de Rêxistina bêkaran "Coxey" bi ordiyeke bêkaran ku gellek ji wan sendîkavan bûn, ji bo hin daxwazan, berê xwe dabû Qesra Sipî. London jî bi hevalekî xwe re da dû şopa vê rêxistinê. Di vê rêwîtiyê de bû şahidê munaqeşeyên pirsên civakî û siyasî. di bin tesîra wan kesên ku di derheqa Marks, Engels, Darwîn, Nietzche û hwd gellek tişt dizanîbûn de ma. Ji ber vê tesîrê gava vegeriya malê, tev li ku 19 salî jî bû, li Lîseya Oaklandê dest bi xwendinê dike. Beşdariya civînên Partiya Karkir a Sosyalîst jî wê demê dest pê dike. Jack Londonê ku ku bi agirê xwendinê dikeliya di 1896-an de dest bi Unîversîteya Berkeley dike, lê li wira ancax salekê diqedîne, dû re dev ji xwendina unîversîteyê ber dide û nema lê vedigere.

Ji bo peydekirina zêran, wî jî wek gellek kesên wê demê berê xwe da Klondikeyê. Wê demê Alaska bi temamî di bin êrîşa zêrgerokan de mabû. Di vê gerrê de hem hêviyên dewlemendbûnê û hem jî heyecaneke pirr mezin hebû. Londonê ku ji maceraye pirr hez dikir jî beşdarî vî karwanî bû û berê xwe da Klondîkeyê. London di vê gerrê de dîrhemeke zêr jî nedîtibû, lê serpêhatiyên ku di pêvajoya êrîşa zêran de hatibûn jiyîn, tiştên ku ew di pêvajoyê de bûbûn şahid, bi serpêhatiyên wî yên zaroktî re ew bi bingeheke xurt ve li nivîsandinê sor kir. Ew munaqeşeyên li Klondîkeyê di pêvajoya ku ew li zêran digeriyan de, tesîreke mezin li fikrên wî yên ku di

warê sosyalîzmê de hebûn, kir. Londonê ku dîrhemeke zêr jî peyde nekiribû, dû re bi saya sefera Klondîkeyê bi awayekî din dewlemend bû. Lê tev vê dewlemendbûnê jî ji ber fêrbûna xwe ya pirr pere xerekirinê, gava mir jî deyndar bû.

London piştî vegera ji Klondîkeyê, bi awakî pirr cidî dest bi xebata nivîskariyê kir. Hinek îddîa dikin ku ger London neçûba Klondîkeyê, ew ê nebûya nivîskarekî navdar. Bi rastî jî tev li ku bi wê musabeqeya kovarê dest bi nivîskariyê kiribû jî çi bû piştî 1898 -an bû, yanî piştî ku ew ji Klondîkeyê vegeriya. Wê demê li Californiyayê gellek kovaran ji bo wergirtina çîrokên wî di ber hevdû de dan. Ji wê rojê û pê ve, rojê hezar gotin nivîsand û ev prensîp heta mirinê qet xera nekir. Pirtûka wî ya yekem bi navê "Lawê Gur" di 1900-î de ket destên xwendevanan. Ev prensîp hişt ku ew bibe yek ji wan nivîskarên herî produktîv. Di navbera 16 salan de li ser hevdû 49 pirtûk nivîsand. Ji vê tê fahmkirin ku wî salê bi kêmanî 3 pirtûk weşandine.

Jack London di şeva 21.11.1916-an de, ji ber nexweşiya xwe di nava nivînê xwe de bû. Bi şev, ji dermanên ku doktor dabûnê dozajeke zêde xwar û roja din çavên xwe bi yekcarî girt. Li gor hinekan sebeba mirina wî, bêdîqetî bû. Lê li gor hinekî din jî wî bi zanebûn weha kiribû û bi vî awayî qedera Martin Eden taqîp kiribû. Gava ku London çavên xwe girt çil salî bû. Wî çil salên xwe qedand, lê ew tev paradoksên xwe yên fikrî jî bi 49 pirtûk (wek Pahniya hesinî-1907, Martin Eden-1909, Qêrîna Wahşetê-1903, Berî Adem-1906, Şampiyon, Geliyê heyvê, Berxwedan, Agir dadan, Kûçikê Sîrkê û hwd ) û gotarên xwe yên bêhejmar ên ku wî li dû xwe hiştin, di dinyaya edebiyatê de, jiyana xwe didomîne.

Jack London ji nava dilê gel û ji kûrahiya civakê dest pê kir, bilind bû, gîhaşt serê keleha cihana edebiyatê û di çapa dinyayê de, bû nivîskarekî navdar... Ew berhemê Amerîkaya wê çaxê bû. Berhemên wî, hem eyna civaka wê demê û guhertinên ku bûn bingehên pêşveçûnê ne û hem jî şahidê pêvajoya ji sedsala 19-an derbasî sedsala 20-an bûyinê ne.

***Mustafa Aydogan***

# ZAROKA ŞEVÊ

Em li wê klûba kevn a Alta Inyoyê bûn. ji bo Sanfransiscoyê şeveke germ bû û di pencereyên vekirî re girregirr û xircira kolanan ji dûr ve û bi awakî lawaz derbasî hundur dibû. Şevbuhêrk ji daweya ruşwetê, ji nîşanên ku serkariya bajêr dê ji karên tarî bête paqijkirinê, hat ser hemû rezalet û rizandina ecêb, hemû awayên dijminatî û basîttiya mirovan. Heta ku navê O'Brien derbas bû, weha dom kir. O'Brien ew boksorê xort yê pêşerojeke rohnî li ber wî xuya dibû ku di wê maça bi xelat ya do bi şev de, hat kuştin. Hewa ji nişka ve paqijtir hat hîskirin. O'Brien xortekî bi îdeal û xwedî jiyaneke pirr paqij bû. Wî ne araq vedixwar, ne çixare dikşand û ne jî sixêf dikir; laşê wî mîna laşê xwedêyekî ciwan bû. Pirtûka xwe ya duayê heta ber qiraxa rîngê, bi xwe re dibir. Dû re li odeya kincguhertinê, ew di bêrîka çakêtê wî de dîtin.

Li vir xortaniyeke paqij, bi sihet, bê leke, serkevtin û mucîzeyên di xeyala wan mirovên ku ew wenda kirine û bûne navosere de hebûn, diyar dibû. Û me ewqasî xeyal kir ku ew romantîzm hat û me ji civata mirovan û ji talûke û stresa wê, bi qasî saetekê bi dûr ve xist. Ev hewa bi saya ku Bardwell peyveke Thoreau anî zimên, dest pê kir. Lê di eslê xwe de, yê ku ruh û can da vê saeta romantîk, Trefethanê kal ê serrût û bi gerden bû. Wî peyv ji Bardwell wergirt û dewam kir. Belkî me di destpêkê de, meraq dikir bê gelo wî ji şîvê û heta nuha çend Skotch vexwariye, lê ev pirr zû hat jibîrkirin.

Trefethan got;

"Di sala 1898-an de bû. Ez wê gavê sîh û pênc salî bûm. Belê, ez dizanim ku hun nuha temenê min dihesibînin. Heqê we heye. Ez nuha çil û heft salî me, lê ez bi qasî deh salan kaltir xuya dikim.

Doktor dibêjin... bila qe, xwedê bela doktoran bide!"

Ji bo ku hêrsbûna xwe hebekî daxîne, qedeha xwe ya dirêj ber bi lêvên xwe ve bilind kir û hêdîka gulpek jê vexwar û got;

"Lê ez wê çaxê xort bûm. Ez beriya nuha bi duwanzdeh salan xort bûm. Por bi serê min ve hebû û zikê min jî bi qasî yê atlêtekî dûz bû. Roja herî dirêj jî ji bo min ewqas dirêj nedihat xuyakirin. Lê ez di sala 98-an de pirr xurt bûm. Milner, ez têm bîra te. Te wê gavê ez nas dikirim. Ma ez ne bê qusûr bûm?"

Milner gotinên wî, bi serê xwe kilkirinê ve tesdîq kir. Ew jî mîna Trefethan muhendîsê madenê bû û li Klondikeyê dewlemend bûbû.

Milner got;

"Belê, tu weha bû, kalo. Ez wê şeva ku wî rojnamevanê hûrik şerr derxist û te wan darvaniyan hemû da ber xwe, qet ji bîr nakim. Slavin wê gavê li gund bû û menajerê wî dixwest bi Trefethan re maçekê li dar bixe. "

Trefethan bi hêrs got;

"Hey, li min binihêrin! Goldsteadê li min weha kir. Xwedê dizane bê çend milyonên min hene, lê di ruhê min de tu tişt nemaye û... di rehên min de jî. Xwîna sor a qenc çû. Ez mîna pîşemasî mim, lodeke protoplazmayê ya pirr qelew û laşgiran, mîna... mîna..."

Lê gotina xwe neqedand û ji qedeha xwe ya dirêj gulpeke teselliyê vexwar.

" Di wê demê de... jinan li min dinihêrîn; dû re ji bo ku dîsa li min binihêrin, di ser situyên xwe re dizîvirîn. Pirr ecêb e ku ez tu carî ne zewicî mim. Lê ew keçik... min ê ji we re behsa wê bikira. Ez bi qasî hezar mîlan dûrî deverekê, li wê rast hatim. Dû re em hîn bi dûrtir çûn. Wê ji min re ew gotinên Thoreau yên ku Bardwall bîstikeke berê anî zimên, xwend; di derheqa xwedêyên bi roj çêbûne û yên bi şev çêbûne, xwedêyên sipî û yên reşik.

Piştî bicîhbûna min a li Goldsteadê bû. Min wê gavê nizanîbû bê

ew çem kaniya xizneyeke çi mezin e. Min ber bi zinarên rojhilat ve dest bi wê rêwîtiyê kiribû. Zinar ji Gola Ésîran a mezin dest pê dikirin. Ew ber bi bakur ve, ne bi tenê pişta çiyê ne; sînorek e, xeta ku rê dibire, dîwarê ku mirov nikare tapelikê û fetih bike, ne. Ji bo derbasbûnê, tu rê peyde nabe. Di zemanê berê de, gerrok di wir re derbas bûne, lê hejmara kesên ku wenda bûne ji yên derbas bûne bêtir in. Min jî herî pirr, ji ber vê yekê, dest bi vî karî kiribû. Kî dibe bila bibe, ev sefer, seferek e ku mirov dikarîbû pê bipesiniya, bû. Ez nuha jî, ji nav wan hemû tiştên ku min kirine, bêtir bi vê dipesinim.

Ew dever erdekî nenas e. Di warê zîvronekên wê yên mezin de, tu carî lêkolîn çênebûne. Li wê derê, geliyên mezin ên ku hîn mirovên sipî pê li erdên wan nekirine, hene. Qebîleyên Çermsoran jî hema hema mîna deh hezar sal berê, paşdemayî ne, lê dîsa jî bi mirovên sipî re hinek pêywendiyên wan çêbûne. Carinan ji bo malbihevdêguhertinê, hinek mirovên sipî tên ba wan, hemû têkilî ewqas in. Heta Şîrketa Hudson Bay jî xwe nikarîbû bigîhanda wî erdî û çandinî lê bikita.

Vêca em bên ser meseleya keçikê. Ez ji cobarekî ber bi jor ve hildikişiyam. Hûn li Kaliforniyayê jê re dibêjin rûbar; ne nexşeya wî hatiye derxistin û ne jî navê wî hatiye danîn. Geliyekî esîl bû. Mirov gava lê dinihêre, dibîne ku li aliyekî bi dîwarên kanyonan ve tête girtin, li aliyê din ve, bi deştên muhteşem û fireh vedibe û li ber çavên mirov tê raxistin. Li wê derê, gîhayên bi qasî bejnekê dirêj, mêrgên bi kulîlkan ve xemilî, rêlên daristanên ladînan yên bakîre ûmuhteşem. Barên kûçikan giran bûn. Lingên wan tev birîn bûbûn û ew pirr westiyabûn. Ji bo bi berfa nû re domandina rêwîtiyê, bi hêviya peydekirina ajoger û taxokan, ez li grûpeke çermsoran digeriyam. Dawiya payizî bû, lê hebûna kulîlkan ez ecêbmayî hiştim. Min nêzîkayî li devera qeşagirtî kiribû û ez di nav qûntarên zinaran re bilind bûbûm. Lê dîsa jî li ber min erdekî bê ser û bin ê bi kulîlkan ve xemilandî, hebû. Wê rojekê koçerên çermsipî xwe bighînin

wê derê ûgenim lê biçînin.

Min dixanek dît û di pê wê re dengên kûçikan bihîst; kûçikên çermsoran, dihatin kampê. Bi qasî pêncsed çermsorên muhterem bûn. Ji goştên perçekirî, weha xuya bû ku nêçîra payizî pirr baş derketibû. Dû re min keçik dît- Lucy. Navê wê weha bû. Me bi tenê bi îşaretan dikarîbû ji hevdû fahm bikira. Min ber bi bereqeya mezin- hun dizanin, konekî ku nêviyê wî ber bi agirê kampê ve vekirîve birin. Ev kon bi temamî ji çermê gakoviyan bû. Çermên gakoviyan yên ku rengê wan qehweyîyekî zêrînî ku hatibûn dûdayîkirin û bi destan ve hatibûn cîlakirin. Hemû tiştên ku di bin wî konî de bûn, bi qasî ku di tu konekî çermsoran de nedihat dîtin, bi rêk û pêk û paqij bûn. Cîh li ser guliyên teze yên ladînan hatibû danîn. Gellek kurk hebûn. Li ser kurkan jî xeftanek ji çermê qubeqazan hebû ku min berê tu tiştekî weha nedîtibû. Li serê nivînan, Lucy bi çarmêrkî rûniştibû. Çermê wê rengê qahweyî yê bihîvan bû. Amazonek ji xwîna esîl û xwediyê laşekî dagirtî bû. Çavên wê şîn bû.

Yên ku dest û lingên min li hevdû gerand jî ev bûn - çavên wêşîn, ne şînê porselenan, lê şîneke tarî, mîna ku derya û ezman tev li hevdû bûne û pirr bi aqil. Wekî din jî dikeniyan, kenekî germ, germeke tavê û mirovî, pirr mirovî û ... ma ez bibêjim pîrekî? Belê weha bûn. Ev çavên jinekê bûn, çavên jineke heqîqî. Hun dizanin bê ez dixazim çi bibêjim, ma ez hîn bibêjim? Di van çavan de di eynî wextê de bê aramiyeke dijwar, hesreteke kûr û aramî, aramiyeke mutlaq, awayekî aramiya zanetî û felsefî hebû.

Trefethan ji nişka ve rawestiya.

– Hun dibêjin belkî ez serxweş im, ne weha? Lê ez ne serxweş im. Ji xwarinê û vir de, ev qedeha min a pênca ye. Hişê min li serê min e. Ez li vê dera hanê, li kêleka xortaniya xwe ya pîroz rûniştî mim. Yê ku dipeyive, ne Trefethanê "kal" e, xorraniya min e û xorraniya min dibêje ku ev çav, çavên herî xweşik ên ku min heta nuha dîtinin, weha aram, weha bê huzûr; weha zana, weha bi meraq; weha pîr, weha ciwan; weha tatmînkar û weha bi hesretê ve hilmiştî. Gelî

zilaman, ez nikarim wan taswîr bikim. Gava ku ez behsa keçikê bikim, hun ê baştir tê bigihêjin.

Ew ranebû ser xwe. Lê destê xwe dirêjî min kir û got; " Biyaniyo, ez bi dîtina te pirr şa bûm." Êdî hun bifikirin, zimanekî weha! Hun dikarin hîsên min texmîn bikin. Ew jinek bû, jineke sipî. Lê ew ziman! Hebûna jineke sipî li vê derê, li sînorê herî dawî yê dinyayê, mirov ecêbmayî dihişt, lê ew ziman! Ew deng dikira guhên min qul bikirana. Mîna notayeke zirav ku ji jora perdeyê dihat lêxistin, bû. Lê tev vê jî ez dikarim bibêjim ku ew helbestvanek bû. Hun ê nuha bibînin. Xwecîh derxistin derve. Wan jî bi ya wê kirin. Wan emir ji wê distendin û bi temamî îraetî emirê wê dikirin. Ew Hi-yu skookum bû, serok bû. Wê ji xwecîhan re got ku divê ew ji bo min çadirekê amade bikin û li kûçikên min binihêrin. Wan jî wek wê kir. Û wan ew bi qasî ku cesaret nekin ku ji nav alavên min rahêlin qayişeke sixtiyan, nas dikirin. Ew kesek e ku divê hertim îataet jê re bihata kirin, bû. Vê rewşê di laşê min de, ricifandinek e ku min di hestiyê xwe de û di mejiyê hestiyê xwe de hîs kir, peyde kir. Ricifandin di sitûna pişta min re heta jêr çû û hat. Li aliyê din î welatê ne tu kesî, bi qasî hezar mîlî dûrî vira, mirov li jineke sipî rast bê ku seroka qebîleyeke hov e.

Wê ji min re got; "Biyaniyo, ji te heye, çermsipiyê ku cara yekem pê li erdê vî gelîyî kiriye, tu yî. Rûnê û bipeyive, em ê dû re tiştinan bixwin. Tu ji kî derê tê yî?"

Dîsa ew dengê hanê. Ancax ez dixwazim ku hun ji vir û heta dawiya çîrokê, vê ji bîr bikin. Min ji bîr kiribû. Ez li wê derê, li kêleka xeftanê ji çermê qubeqazan bû, rûniştibûm û min li pîreka şehane ya di nava rûpelên pirtûkên Thoreau an pirtûkên hinekî din de derdiket, dinihêrî û li wê guhdar dikir.

Ez li wira, li ser daxwaza wê, hefteyekê mam. Wê hem ji bo peydekirina kûçikan û taxokê, hem jî ji bo ku xwecîh min bi qasî pêncsed mîlî di nava zinaran de, di zaboqên herî baş re derbas bikin, soz da min. Çadira wê dûrî yên wan û li perê bilind ê çem hatibû vegir-

tin. Çend keçikên xwecîh jî xwarina wê çêdikirin û karên kampê dikirin. Em peyivîn û peyivîn. Heta ku berfa yekem ket û ji bo taxokên min erd musaît bû, em peyivîn. Ev çîroka wê bû.

Ew li nêzî sînor hatibû dinyayê. Ji koçerên feqîr bû. Hûn dizanin bê ev tê çi maneyê; kar, kar, hertim kar, karekî pirr û tu carî naqede.

Wê got; " Min xweşbûna dinyayê qet nedîtiye. Wextê min tunebû. Min dizanîbû ku ew li derve, li devereke, li dora qulûbeyê ye, lê diviyabû nan bihata lêxistin, paqijkirin, şuştin, kar qet nediqediyan. Min carinan di dereceya nexweşiyê de dixwest ji hemû karan xelas bibim ûxwe biavêjim derve û tew di biharî de dengê çivîkan hişê min ji serê min dibirin. Ji bo ku ez bikaribim derûdora xwe têr bibînim, min dixwest tev lingên xwe yên ji xunavê şilbûyî, di nava gîhayên bilind re baz bidim, xwe di ser çeperan re biavêjim, daristanan li dû xwe bihêlim û xwe bighînim çiyayan. Ax, ez bi hesreta hertiştî bûm. Min dixwest ku ez çem û çem bimeşim, ji kaniyan avê pijeqînim, bi masiyên belek re bibim dost û bi dizî li sihorîk, kîroşkan û ruhberên biçûk temaşe bikim û bizanibim bê ew çi dikin û sirra rêya wan çi ye. Min weha bawer dikir ku ger wexta min hebuya û ez di nava kulîlkan re bi bêdengî bi xwê re biçûma, min ê ew gava bi hevdû re dikirin pise-pis ûji hevdû re her tiştên biaqil yên ku mirovan qet pê nizanîbûn digotin, zevt bikira."

Trefethan dengê xwe birrî û ji bo bê hela qedeha wî hariye dagirtin an na, li qedeha xwe nihêrî.

Carekê weha got: 'Min dixwest ku ez bi şev mîna ruhbereke dirinde baz bidim, bi tenê di bin tava heyvê û stêrkan de baz dan, di wê şevreşa ku ez dizanim dê bişibe qedîfeyê sar de, sipî û tazî baz dan, baz dan, bê rawestan baz dan. Évarekê ez êdî bêhawe aciz bûbûm. Rojeke pirr germ bû. Hevîr nexwestibû hilê, bişavtin şaş hatibû kirin û ez pirr hêrs û gêj bûbûm. Belê, min wê êvarê ji bavê xwe re behsa xwestina xwe ya bazdanê kir. Wî piçekî bi meraq û piçekî jî bi tirs li min nihêrî. Du heb dan min. Ji min re got, here razê, he-

ta sibehê dê tu tiştekî te nemîne. Min ne jî wî re û ne jî ji tu kesên din re, careke din behsa xwestinên xwe nekir.'

Mala li çiyê belav bûbû. Bi qasî ku ez dizanim malbatê ji birçîbûna bar kiribû û çûbû Saetleyê. Wê li wê derê, di fabrîkeyekê de kar dikir; karekî giran û saetên dirêj. Piştî ku bi vî awayî salek derbas kir, li restoranteke basît û erzan bi şagirtî xebitiye. Wê navê wê restorantê kiribû, xwaringehka feqîran. Wê ji min re carekê got ku 'Qey min romans dixwest. Lê ne di legana ku arava firaxan tê de bû de, ne li fabrîkeyan ne jî li ba xwediyên van xwaringehkan tu romans tunebû. '

Gava zewicî, 18 salî bû. Bi zilamekî ku dê ji bo vekirina restorantekê biçuya Juneauyê re zewicî bû. Mêrik hinek pere dabûn ser hevdû û ji ber vê jî pêşeroja wî rohnî xuya dikir. Keçikê jê hez nekiribû. Keçikê di vê de bi înat bû. Lê ew êdî aciz bûbû û xwestibû ji wê aciziya xwe xelas bibe. Juneau li Alaskayê ye. Xwestina wê ya ji bo dîtina vî diyarê muhteşem, bûbû îhtirasek. Lê beşekî pirr hindik jê dîtibû. Mêrik restorant vekiribû, devereke biçûk û erzan bû. Hîn demeke dirêj derbas nebûbû ku keçikê fabm kiribû bê mêrik ji bo çi bi wê re zewicîbû; ji bo xwe ji dana meaşekî xelas bike. Wê hema hema hemû karên xwaringehkê dikir. Ji şagirtiyê heta firaxşuştinê. Gellek caran, çêkirina xwarinê jî dibû para wê. Bi vî awayî çar sal derbas bûne.

Hun dikarin wê ruhbera daristanên dirinde, wê pîreka ku bi hemû daxwazên kevn ên xwezayî û bi hesreta azadiyê ve dagirtî, lê di maweya çar salên ku nayên tehamulkirinê de, li xwaringeheke feqîr bê rawestan xebitiye, bînin ber çavên xwe?

Wê got ku 'Hertişt bê mahne bû. Ev hemû ji bo çi bûn? Ez ji bo çi hatibûm dinyayê? Ma mahneya jiyanê ev bû? Kar kirin, kar kirin ûhertim westiyayî razan, westiyayî şiyar bûn û ger yek ji ya din ne dijwartir be, her roj mîna roja berê?'

Ji încîlê ew jiyana nemir bihîstibû, lê ferq nedikir, tiştê ku wê dikir, ji bo nemirtiya wê amadebûnek bû. Belkî firktir, lê wê xeyalên

xwe didan jiyandin. Çend pirtûk xwendibûn? Texmînkirina navên wan gellek zehmet bû. Bi îhtimaleke mezin romançn Pirtûkxaneya Perrê Deryayê bûbûn adana xeyalên wê.

Wê got ku 'Carinan gava ku ez ji ber germahiya metbexê gêj dibûm, ger min hewa paqij nestenda, wê dilê min ji bîr biçuya. Min serê xwe ji pencereya metbexê dirêjî derve dikir, çavên xwe digirt û tiştên herî muhteşem didît. Min ji nişka ve didît ku ez di rêyeke pesar de, ber bi jêr ve dadiketim, hertişt paqij û bê deng, bê toz, bê gemar, bi tenê sira bayê ku gîhayên xweşik kil dikirin, berxên ku bi hevdû şa dibûn, bêhna kulîlkên ku bi bê re dihat û di ser hertiştî re tîrêjên xweş yên tavê, çêlekên dilovan ên ku di pingarên ava bê deng ku dida çongê de, tiralî dikirin û keçikên ciwan ên ku di zîvironeke çem de xwe dişuştin, hemû jî sipî, tenik, pak û xwezayî.

Min wextekê di pirtûkekê de li ser vî welatî xwendibû. Belkî wan şovalyeyên ku di tîrêjên rojê de dibiriqîn dê di rê de, di zîvironekekê de bizîviriyan û li ser hespan xuya bûbûyan, an jî min leydiyek ku li ser mehîneke sipî boz û bircên keleha ku ji dûr ve bilind dibû, didîtin. Min ewqas baş dizanîbû ku ez ê di zîvironeka yekem de bihatama qesrekê; sipî û hewadar û mîna ku di çîrokên periyan de bi fîskiyeyên li dora xwe dizîvirîn ve û li her deverê wê, teyrên tawiz ên ku di nava mêrg û kulîlkan de; dû re min çavên xwe vedikir ûgerma firna germ li ser çavên min dixist. Min dengê Jake dibihîst. Jake mêrê min bû. Ji min re digot 'Te fasûlye ji bo çi nebirin? Ji te heye ku ez ê hemû rojê li vê derê bimînim?'

Romans! Ez dibêjim qey dema ez herî nêzîkî romansê bûm, beriya wê gava ku nanpêjekî Ermenî yê serxweş, aqilê xwe bi temamî wenda kir û dikita bi kêra metbexê ez serjêbikirama û min ew bi wê aleta ku me pê petat dieciqand, li erdê rast kir, min milê xwe bi sobê venîştibû, bû.

Min rêyên hêsan, tiştên xweş û romans dixwest. Lê weha xuya bû ku tu şensa min tunebû. Ez bi tenê û nemaze ji bo xwarinçêkirin ûfiraxşuştinê hatibûm dinyayê. Li Juneauyê wê demê qelabalixeke

dijwar hebû, min bala xwe da pîrekên din, jiyana wan tu heyecan neda min. Qey min dixwest ez paqij bim. Ji bo çi? Min jî nizanîbû. Xuya bû, min bi tenê dixwest û min weha bawer dikir ku bê çawa ez bi şuştina firaxan dikaribûm bimirama, bi mirinekee wek mirina wan jî bimirama."

Trefethan çîrok birrî, demekê bêdeng ma. Tevlihevbûna di warê fikrê de bi xwe serrast kir û got;

" Belê, ev pîreka ku ez li herêma Arktîkê rastî wê hatibûm, qebîleyeke hov û erdekî nêçîrê ku bi qasî çend hezar mîlan bû, îdare dikir. Ev pirr jî hêsan çêbûbû. Tabîî, ew dikaribû di nava firaxan de jî bimira. Lê xewn û pise-pis derketin ortê. Ev hemû pêwîstî bû û wê ew bi dest xist.

Wê got ku 'Ez sibehekê ji xew şiyar bûm. Tam li ser perçeyekî rojnameyekê bû. Hemû gotinên li wira, tên bîra min. Ger tu bixwazî, ez dikarim ji bo te bixwînim! Dû re, beşek ji Qêrîna Mirov ji Thoreau xwend. Temaşaya çamên li erdê gêris ku sal bi sal mezin dibin, ji bo min pirr xweş e. Em behsa medenîkirina xwecîhan dikin, lê navê pêşvebirin û baştirkirina wan, ne ev e. Xwecîh bi serxwebûna şiyar a jiyana tarî ya daristanên çilmisî û bi tenêtiyê ve, pêywendiyên bi Xwedêyên xwe re diparêze û wek civakeke ecêb tê qebûlkirin. Nerîneke wan a wek çirûsandina stêrkan ku ji bo meyxaneyên me, pirr xerîb e, heye. Bi tenê ji ber durûtiyê, gava ew ronahiya rawestiyayî ya di ruhê wan de heye ku bi ronahiya mûman a bi îhtişam, lê kêm û emirkurt re bête muqayesekirin, mîna rohniya stêrkan a qels, lê pirr xweş xuya dike. Xwedêyên civaka giraviyan bi roj çêbûne, lê bi qasî xwedêyên ku bi şev çêbûne, nayên qebûlkirin.'

Û wê weha kir, gotin bi gotin tekrar kir. Min dengê wê yê medenî ji bîr kiribû. Ji ber ku îzahateke cidî ya olî bû- belkî pûtperest û di nava kincên xwe yên jîndar de-.

Wê bi dengekî xemgîn got; 'Dawiya wê hat çirandin û avêtin. Bi tenê perçeyekî rojnameyê bû. Lê ew Thoreau miroveki bi aqil bû. Min dixwest ku ez di derheqa wî de xwediyê agahdariyên zêdetir

bim! `

Ew hebekî rawestiya û bawer bikin ku gava wê got; `Ez dikarîbûm ji wî re bûbûma jineke baş` ruyê wê, bi qasî ku mirov nikare bi gotinan bîne zimên, pîroz bû.

Dû re dewam kir; `Gava min ew xwend, ez tê gihîştim ku bê problema min çi ye. Ez bi şev çêbûbûm. Ez, ew kesa ku hemû jiyana xwe bi yekî ku bi roj çêbûye re derbas kiriye, şevza bûm. Ji ber vê yekê, ez bi çêkirina xwarinê û şuştina firaxan tatmîn nedibûm. Ji ber vê, min di tava heyvê de şût î tazî bazdan, xwestibû. Û ez tê gihîştibûm ku xwaringeha feqîran a biçûk î gemarî ne cîhekî li gora min bû. Gava min ev fahm kir, min got, ev kar qediya! Min çend perçe alavên xwe hazir kir û ez ketim rê. Jake ez dîtim û xwest min rawestîne. Got, tu çi dikî? Min got, Ez ji te vediqetim. Ez ê ber bi daristanên bilind ve biçim, cîhê min ew dever e. Ji bo girtinê destê xwe dirêjî min kir û got, `Na na, tu naçî. Germahiya firnê li serê te xistiye. Beriya ku tu dînîtiyekê bikî, li min guhdar bikî` Lê min devançe - Colteke biçûk bû- lê kişand û min gotê, ev ê li ser navê min bipeyive û ez ji wir veqetiyam."

Trefethan qedeha xwe vala kir û yeka din xwest.

" Begno, hun dizanin, bê vê keçikê çi kir? Emrê wê, bîst û du sal bû. Hemû jiyana xwe li ber legana ku firax tê de dihat şuştin, derbas kiribû û di derheqa dinyayê de, ji zanebûna min a li ser ebada çarem an jî pêncem bêtir, tu tişt nizanîbû. Hemû rê ber bi hedefa wê ve diçûn. Na, wê muracaetî tu salonên reqsê nekir. Li Alaskaya ku dirûvê destiyê taweyekê dide, bi botê rêwîkirin, bêtir tê tercîhkirin. Keçik çû, perrê avê. Kanoteke çermsoran wê biçûya Dyedyê. Hun dizanin, ev ji koka darekê bi tenê çêdibin, zirav, kûr û dirêjbûna wan, şêst pê ne. Çend dollar da wan û li kanotê siwar bû.

Ji min re got; `Romans? Ji serî û heta binî ve romans bû. Di kanotê de sê malbat hebûn. Bi kûçikan û bi zarokên berşîr ên çermsoran ku bi çarpiyan vir de û wê de diçûn, welhasil di wê kanota ku ewqas teng bû ku mirov nikarîbû xwe bizîviranda, herkesî bêrikek

di avê de dadikir ûkanot dimeşandin. Çiyayên bilind yên serê wan bi dûman, dorhêl girtibûn. Ewrên tevlihev diherikîn, tav hebû. Û ax, bêdengî! Bêdengiya kûr û muhteşem! Mirov dikarîbû ji dûr ve dûmana kampa nêçirvanan a di nava daran de dizîvirî û bilind dibû, bibîne.

Min digot, qey ez li seyrangehê mim, li seyrangeheke mezin, min didît ku xewnên min rast digerin. Ez ji bo qewimandina tiştekî amade bûm. Ûew tişt qewimî jî.

Û ew kampa yekem li giravê! Zarokên ku di devê çem de, bi şewkê masî digirtin û ew pezkoviya mezin a ku gava tam em li tengavê zîvirîn, çermsorekî bera wê da. Her alî bi kulîlkan ve hatibûn xemilandin. Ji perrê avê ber bi hundur ve, gîha tof, şil û bi qasî bejnekê bilind dibûn. Hinek keç bi min re ketin nava gîhê. Em ji aliyê dawiyê ve ber bi gir ve hilkişiyan û me kok û tûfiringîyên tirş lê xwarina wan xweş berhev kirin.

Em di nava erdê tûfiringiyan de li hirçekî mezin ku şîva xwe dixwar, rast hatin. Wî got; "oyy!" û bi qasî me tirsiya û reviya. Dû re, kamp, agirê kampê û bêhna goştê pezkoviyê yê ku sor dibû. Harîqa bû. Asoxî, ez bi yê ku bi şev çêbûbû re bûm. Min dizanîbû ku ez malê vira mim. Belkî jî ez di jiyana xwe de, cara yekem wê şevê gava ez razam, bextiyar bûm. Ji ber ku wê şevê, min di binê qoziyeke çadirê re, li wan stêrkên reş ên li ser serê girekî xuya dikirin, nihêrî, guhên xwe da dengê şevê û bi şuûta ku eynî tişt dê roja din û hertim jî dom bike, ez paş de venegeriyam.

Romans! Roja piştî wê, min ew bi dest xist. Diviyabû ku em di milekî mezin ê Okyanûsê re derbas bûbûna- bi kêmanî duwanzdeh an jî panzdeh mîl hebû- bê dest pê kir û tam gava ku em li ortê bûn, kanot wergeriya û çû binê avê. Ez wê şevê bi kûçikekî guran re derketim sahîlê. Ez bi tenê sax filitîbûm.` "

Trefethan navbir da çîrokê û got; " Lê bifikirin, kanot perçe bûye ûketiye binê avê. Ji derveyî wê, herkes li zinaran ketine û mirine. Wê bi terriya kûçik girtibû, xwe ji zinaran paraztibû û bi vî awayî

gîhaştibû sahîlê. Heta wê sahîla ku dirêjahiya wê, gellek mîl bû, bi tenê avjenî kiribû. Wê got; `Ev şenseke mezin bû ku reşahî bû. Ez bi vî awayî tam bi paş de vegeriyam. Ez ketim rê û di nava daristanan re, di ser çiyayan re, hertim ber bi pêş ve meşiyam. Min digot, qey ez li tiştekî digeriyam û min dizanîbû ku ez ê bibînim. Ez ne ditirsiyam. Ez bi şev çêbûbûm. Daristanên mezin nikarîbûn min bikuştana. Û min ew, roja duduyan dît. Ez hatim devereke biçûk a weha vekirî, qulûbeyeke nîvxerabe hebû. Ji gellek salan û vir de, tu kes tê de ne jiyabû. Jora wê hatibû xwarê. Betaniyên kom bi kom rizyayî, li wira bûn. Li ser sobeyê firax hebûn. Lê tiştê herî xerîb, ne ev bû. Li derve, li ber daristanê, tu di jiyana xwe de nikarî texmîn bikî, bê min çi dît. ïskeletên heyşt hespan, her yek bi darekê ve hatibû girêdan. Ez weha texmîn dikim ku ew ji birçîna mirine. Li dû wan bi tenê komên biçûk ên hestiyên wan î ku ji hevdû belav bûbûn, mabûn.

Li pişta her hespekî barek hebû. Barên wan, li wira di nava hestiyan de mabûn - torbeyên boyaxkirî... di hundurê torbeyên ji çermên pezkoviyan de û di hundurê wan de - bi te di hundurê wan de çi hebû?' Wê dengê xwe birrî, di quncikekê re, destê xwe di nava guliyên ladînan re dirêj kir û torbeyekî çerm kişand. Devê wî vekir û zêrên herî xweşik bera destê min da. Zêrên destpênebûyî, zêrên ku ava çeman ew anîbûn. Hinek hûr bûn, lê pirraniya wan, kulçe bûn û weha teze û hişk bûn ku mirov digot qey tu carî av bi wan nebûye!

Ji min re got; `Tu dibêjî ku ez muhendîsê madenê mim. Tu vî welatî jî nas dikî. Tu dikarî navê çemê ku ev zêr aniye, bibêjî?`

Min nizanîbû. Tu zîv tê de tunebû. Hema hema zêrê safî bû. Min ev ji wê re jî got.

Wê got; `Rast e. Ez ê onsa wan bi nozdeh dollaran bifroşim. Zêrê Eldoradoyê jî ji hîjdeh dollaran zêdetir nake. Tu kes ji bo zêrê Minookê jî tam hîjdeh dollaran nade. Min ev di nava hestiyan de dît, lê tam heyşt barên hespan di her barekî de sed û pêncî Paund.`

Min dengê xwe bilind kir û got; Ev du sed û pêncî hezarî dike.

Wê got; `Min jî bi texmînî weha hesibandibû. Em behsa romansê bikin! Ez, wê kesa ku ewqas sal koletî kiribû, gava ez derketim derve, piştî sê rojan, ev qewimî. Baş e, çi bi wan zilamên ku ev zêr derxistin hat! Ez hertim lê difikirim. Hespên xwe barkirî û girêdayî hiştine û ji vê dinyayê wenda bûne. Li dû xwe, tu şop mop nehiştine. Min qet nebihîstiye ku behsa wan hatiye kirin. Tu kes di derheqa wan de tu tiştî nizane. Belê, mîratxura wan a bi heq, wek şevzayekê ez bûm.'

Trefethan ji bo çixareyekê pê xê, rawestiya û dû re dewam kir;

"Hun dizanin bê vê keçikê çi kir? Sîh ons ji xwe re veqetand û yên din li sahîlê veşart. Dû re, bi îşaretekê kanota ku di wir re derbas dibû, sekinand û çû bazara Dyeayê. Ji Pat Healyê tişt kirrîn û berê xwe da geliyê Chilcootê, ev bûyer di 88-an de ye. Sal 88 bû, heyşt sal beriya êrîşa Klondikeyê bû. Wê demê Yukan devereke xalî bû. Ji zilamên çermsor ditirsiya, du pîrekên çermsor bi xwe re bir, di gol û çeman re derbas bû û hat kampên kevn ên Yukana jêr. Piştî ku li wê derê çend salan geriya, dû re hat wî cîhê ku ez pêrgî wê bûbûm. Ji wî welatî hez kiribû. Wê weha got. Tiştê ku herî bêtir bala wê kişandibû û tesîr lê kiribû jî, li binê newalê pezkoviyeke mezin a di nava keskesorê de, bû, ye. Bi xwecîhan re têkilî danî, di halê nexweşiyê de li wan nihêrî, bawerî da wan û hêdî hêdî dest bi îdarekirina wan kir. Carekê ji wê derê veqetiya, wê gavê jî bi grûpeke xortên çermsoran re çû Chilcootê, zêrên ku veşartibû, derxist û anî ba xwe.

Wê got; `Û nuha ez li vê derê mim, rêwiyo' û çîroka xwe qedand. `Tiştê herî hêja ku ez xwediyê wê mim, va ye.` got û kîsikekî biçûk ku ji çermê pezkoviyan hatibû çêkirin, derxist. Wek madalyonekê xistibû situyê xwe. Kîsik vekir. Di hundurê kîsikê çerm de, perçeyê rojnameyeke ku jêdera ji Thoreau tê de, kevn, zerbûyî û li hevirmêş pêçayî, hebû. Min jê pirsî; baş e, tu bextiyar î?... Tiştên ku te dixwest, te bi dest xist? Piştî ku du sed û pêncî hezarên te hene, tu ne

mecbûr î li eyaletên jêr bixebitî. Xuya ye, tu pirr bêriyê dikî.

Wê got; `Ne gellekî. Ez cîhê xwe bi cîhê tu pîrekên eyaletên jêr nadim. Ev mirovên min in, ez malê vê derê mim. Lê carinan`- Çavên wê bi hesreta kûr ya ku min berê behs kiribû, biriqand- `Carinan ez weha dixwazim ku bila tiştê herî ecêb bête serê vî Thoreauyê.`

Min pirsî; Ji bo çi?

Wê got; `Bi vî awayî, ez ê bikarîbûma pê re bizewiciyama. Ez carinan xwe pirr bi tenê hîs dikim. Ez pîrek im, tam pîrek. Ez dizanim ku behsa pîrekin din ku mîna min digerin û tiştên xerîb dikin, tê kirin. Pîrekên di ordiyê de leşker, di keştiyan de deryavan. Lê ev pîrek pirr ecêb in. Ji pîrekan bêtir dişibin zilaman û îhtiyacên wan, ne wek yên pîrekên normal in. Ew evînê naxwazin, di himbêza xwe de, an jî li dora xwe zarokên biçûk jî naxwazin. Ez ne ji van celeban im. Ma ne rast e, rêwiyo? Ma ez dirûbê zilaman didim?`

Wê bi rastî ditubê wan ne dida. Ew pîrekek bû, pîrekeke xweşik, pîrekeke di rengê qahweyî yê bihîvan de bû. Laşekî wê yê xurt û bi sihet û çavên wê, şînê tarî û xweşik yên pîrekan bûn.

Wê ji min pirsî; `Ma ez pîrek im? Ez pîrek im. Ez ji her alî ve pîrek im, lê ya xerîb ew e, tev ku ez di hertiştî de zaroka şevê, zaroka xwezayê mim, lê gava pirs tê zewacê, ez ne weha mim. Ez bawer im ku ev cins, pirranî cinsê xwe dikin. Ez weha mim, em çawa bikin, ez hertim weha mim.`

Min got; Ma tu dixwazî ji min re tiştekî bibêjî?

Wê got; `Qet` û bi sertiya rastiyê ve, li hundurê çavên min nihêrî.

`Mêrekî min hebû. Ez ji wî re dibêjim, ga; li wî bigere, ger ez rojekê vegerim wan deveran, tê bibînî ku ew eyn wek navê ku min lê kiriye, ye.`

Min piştî du salan mêrik dît. Tam wek gotina jinikê bû. Cangiran û bê hîs, gayekî ku hertişt tev li hevdu dikir û li maseyan miqate bû. Min jê re got; îhtiyaca te ji bo alîkariyê, bi pîrekekê heye.

Wî got; 'Yek hebû'

Min jê pirsî; Ma tu mêrekî bî yî?

'Belê, wê aqilê xwe wenda kir. Ji xwe, wê hertim digot ku germahiya metbexê dê rojekê min dîn bike. Û weha jî bû. Rojekê, devançe li min kişand û li kanotekê siwar bû û bi çermsoran re reviya. Li deryayê firtone li wan rabuye. Hemû fetisînin.'"

Trefethan bi qedeha xwe biliya û bêdeng ma.

Milner bi israr pirsî; 'Baş e, lê keçik? Tam gava ku çîrok hesas ûenteresant bû, te birrî. Ma weha dibe?

Trefethan got; "Dibe. Wek ku wê jî digot; ew ji derveyî zewacê, di hertiştî de hov bû û cinsê xwe dixwest. Pirr nazîk bû. Wê raste rast dest bi meseleyê kir. Wê dixwest bi min re bizewice.

Ji min re got; 'Biyaniyo, ez te dixwazim. Tu ji vê jiyanê hez dikî. Na na, te payizî xwe bêsebeb li van zinaran nedigirt. Ev dever, pirr xweş e. Ger tu li vira bimînî, wê belkî bi te hîn xweştir bibe. Tu ji bo çi namînî? Ez ê ji te re bibim jineke baş.'

Hertişt bi min ve girêdayî bû. Ew li bende min bû. Ez înkar nakim, ez nîvevîndarî wê bûbûm. Hûn dizanin ku ez qet nezewicîmim. Ger ez weha li jiyana xwe binihêrim, ez dikarim pirr bi rehetî bibêjim ku pîreka ku bi vî awayî tesîr li min kiriye, ew bi tenê ye. Lê hertişt weha bûbû ku aqilê mirov nedigîhaştê û min wek centîlmenekî derew lê kir. Min jê re got; ez zewicî mim.

Wê pirsî; 'Ma jina te li bende te ye?'

Min got; erê.

'Ma ji te hez dikî?'

Min got; belê.

Hertişt ev bû. Ew li hember derneket, lê bi tenê carekê, wê gavê piçekî hêrs bûbû.

Got; 'Tiştê ku divê ez bikim, bi tenê dîrektîv dayin e. Ger ez dîrektîvê bidim, wê gavê tu nikarî ji vira biçî tu deveran. Ger ez dîrektîvê bidim, tu li vira dimînî... Lê ez ê nedim. Ger tu min nexwazî, ez jî te naxwazim... û tu min naxwazî.'

Çû ji min re malzeme peyde kir û ji bo rêwîtiyê alîkariya min kir. Gava em ji hevdu veqetiyan, ji min re got; 'Te gellekî eyb kir, biyaniyo. Min ji nerînên te hez kir û kêfa min ji te re tê. Ger tu fikra xwe biguherînî, paş de were.'

Édî bi tenê tiştek mabû ku min dixwest, ez bikim; ew jî maçîkirineke veqetandinê bû. Lê min nizanîbû, bê ez ê çawa bikim. Belkî qebûl nekira. Wek min got, ez nîvevîndar bûm. Baş bû ku wê ev mesele hel kir. Ji min re got; 'Min maçî bike, biyaniyo! Bi tenê ji bo çûyin ûbibîranînê.'

Û me hevdû li geliyê çiyayê zinaran, di nava berfê de maçî kir. Min ew li wê derê, li ser rê hişt û min da dû kûçikên xwe. Heta ku min gelî derbas kir û ez daketim jêr û gîhaştim bazara li kêleka Gola mezin a Ésîran, şeş hefte derbas bûn."

Qelebalixiya cadeyan mîna pêlekê, ji dûr ve digihîşt guhên me. Garsonê ku bi bêdengî kar dikir, qedehên me ji nû ve dagirtin. Di bêdengiyê de, dengê Trefethan wek nakosa cenazeyê bû.

" Ger ez li wira mabûma, dê baştir bûbûya."

Me simbêlên wî yên sipî, devera rût ya serê wî, kîsikên werimî yên di bin çavên wî de, gepên wî yên daliqyayî, gerdana wî ya qelew, betilîbûna giran, sistbûn û qelewbûna wî dît. Vana hemû ketina zilamê ku demekê xurt bû, lê pirr baş û rehet jiyabû, nîşan didan. Bardwell hema hema bi awayê pise pisê got; " Ne dereng e, kalo?"

Trefethan qîriya; " Hey Xwedêyo! Xwezka, ez ne tirsonek bûma! Wê gavê ez ê paş de vegeriyama ba wê. Ew hîn li wira ye. Min dikarîbû li siheta xwe binihêriya û li wê derê, bi wê re pirr dirêj bijiyama. Li mayina li vir întixar e, lê ez kal im; çil û heft salî. Li min binihêrin, mesele..."

Trefethan qedeha xwe rakir, lê nihêrî û dû re dewam kir; " Mesele, hêsanbûna vê celeba întixarê ye. Ez nerm û nazîk im. Heta fikra rêwîtiya dirêj a bi kûçikan re jî min ditirsîne. Fikirandina li serma serê sibehan û qarmiçiyên taxokan jî min ditirsînin. "

Qedeh ji derveyî îrada wî, ber bi lêvên wî ve bilind bû. Bi pêleke esabê, xwest qedehê biavêje erdê, lê dû re poşman bû û rawestiya. Tiştekî din hat bîra wî. Qedeha xwe ber bi lêvên xwe ve bilind kir û rawestiya. Bi dilşewatî û bi qehir keniya, lê peyvên wî bi tesîr bûn;

" Belê, em ji bo zaroka şevê, ji bo şevzayê vexwin. Ew mûcîzeyek bû."

# XWÊDANA ENIYÊ

Va wextê kar hat. Xwedê min ji karê min veneqetîne.
Ger ez berî ku şev bi ser me de were bimrim,
Hêviya min ji xwedê ev e ku bila karê min qediya be.
Amîn

"Johnny, binihêre, ev cara talî ye ku ez ji te re dibêjim; ger tu ranebî, divê tu taştê ji bîr bikî!"

Ev forta hanê çavê lêwik netirsand. Lawik, weke yekî ku xewneke pirr xweş didît û ne dixwest jê şiyar bibe, heta ku jê dihat di berxwe de dida. Destên wî bi sistî hatin girtin û kulmikin lerzokî li hewa kil bûn. Hedefa van kulmikan diya wî bû. Lê jinikê dema ku bi milên wî girt û kil kir, weke hertim vê carê jî xwe ji kulmikên wî parast.

"Min rehet bihêlê!"

Ev bangkirin weke bi destanpeyvandina yekî razayî dest pê kir û dû re ji nişka ve bilind bû û bû qêrîneke dijwar. Di taliyê de jî hêdî hêdî qels bû, di devê wî de bû weke vinvineke ku nedihat fahm kirin û wenda bû. Mirov digot qey, êşeke giran dikşîne û li hember jiyana xwe îsyan dike. Lê diya wî, qet guh neda vê reaksiyona wî. Pîrekeke weha bû ku mirov ji çavên wê xemgîniya wê û ji rûyê wê jî betilîbûna wê dikaribû bixwenda. Ev wezîfa ku wê her roj dikir, êdî ne xema wê bû. Xwe çengî lihêfê kir û xwest ku ji ser lêwik bavêje. Hingê lêwik dev ji kulmikavêtinê berda, bi awakî bê hêvî hişk bi lihêfê girt û xwe li çarşefa ku li binya nivîna bû, gerand. Jinikê îcar xwest çarşefê ber bi erdê ve bikişîne. Demekê di ber hev de dan. Jinik ji wî girantir bû. ji ber vê yekê hem lêwik û hem jî lihêfê maxlûbiyet qebûl kirin. Lawik ji bo xwe ji serma dijwar ya odeyê biparê-

ze, bêî ku lihêfa germ berde, tevî çarşefê, xwe heta ber nivînê xwe, bi erdê re kişand. Heta kêleka nivînê xwe hat. Dema li xwe hay bû ku dike bi ser serê xwe de bikeve û bigindire, ji nişka ve şiyar bû û balansa xwe serrast kir û li ser lingên xwe ket erdê. Di eynî wextê de, diya wî ew ji milên wî girt û kil kir. Lawik careke din dest bi kulmikan kir. Vê carê kulmikên wî xurttir û serrasttir bûn. Ji nişka ve çavên wî vebûn. Hingê diya wî milên wî berda. êdî şiyar bibû.

Lawik di ber xwe de got::

"Temam temam"

Jinikê rahişt lampê û lawik di tarîyê de hişt û derket derve. Dema ku di derî re derket, bala lêwik kişand û got:

"Ew dê pereyên te bibirin ha!"

Johnny guh neda tarîyê. Kincên xwe li xwe kir û berê xwe da metbexê.

Hew hestî û çerm ma bû. Lê bi saxlemî pê li erdê dikir. Halbûkî çîpên wî weke darikan bûn. Mirov digot qey ew dê nikaribin giraniya laşê wî hilgirin. Kursiyeke ku binîjêketî bû kişand bin xwe û li kêleka maseyê rûnişt.

Diya wî bang kir:

"Johnny!"

Johnny ji cîhê xwe pengizî. Bêî ku tu gotin ji devê wî derkeve, berê xwe da (lawabo) destşokê. Destşok bi rûn bû. Pirr gemarî bû. Ji qulika wê, bêhneke weke bêhna beratê dihat. Guh nedayê. Tu tişt nikaribû bi qasî hatina bêhna pîs ji lawabo, tebîî ba. Ji aravê reşbûna sabûnê û kefdan jibîrkirina wê jî tebîî bû. Sabûn kef bide, dê çi bibe, kef nede dê çi bibe. Ger te çend dilop av li ser çavên xwe kiribe, temam e. Diranên xwe fitçe ne dikir. Tew di emrê xwe de, firçe-mirçe jî nedîtibû. Wî tew nizanîbû ku li ser rûyê erdê, bêaqilên bi qasî ku diranên xwe firçe bikin jî hebûn. Diya wî bi ser wî de kir pit pit û got:

"Qe, rojekê bêî ku min ji te re bigota, te ruyê xwe bişuşta!" Jinikê kapaxa misînê qehwê bi destê xwe girtibû û qehwe dixist finca-

nan. Lêwik dengê xwe dernexist. Ji ber ku ev mesela serçavşuştinê, hertim dibû sebebê munaqeşeyê. Diya wî serê wî dixwar. Rojê carekê ji mecburî divê serçavê xwe bişuşta. Bi peşgîreke peritî ya bi rûn, şil û gemarî, xwe zuha kir; pirtikên peşgîrê bi ruyên mirov diman. Dema ku hate ser sifrê, diya wî jê re got:

"Xwezî em ewqasî ne dûrî cîhê kar bûna. Tu dizanî ku çi ji destên min tê, ez dikim. Lê em çawa bikin, ew dolara ku ji ber kirê dimîne, pirr girîng e. Tew odeyên vir jî pirr in, tu bi xwe jî vêya dizanî."

Gotinên diya wî di guhekî wî re diketinê û di yê din re derdiketin. Eynî gotin ewqas dibîhîst ku! Diya wî pîrekeke nezan û serhişk bû. Gava devê xwe vedikir, eynî mesele bû; peyv hettim dianî ser wan derdên ku ji ber mala wan dûrî fabrîkê ye, dikşînin.

Lawik bi awakî ku peyvekê li binçengê diya xwe xe, got:

"Rast e, dolarek, tê wê maneya ku çend pariyên zêde dê têkeve qirika me. Divê ez bilezînim û têkevim rê. Ka wê taştiyê bîne."

Nanê xwe nîvco dicût, ew pariyên ku baş nedihat cûtin, bi xêra qehweyê dadiqurtand. Bi lez dixwar. Ew tiştê ku wî vedixwar, dişibiya aravê. Ji bo ispatkirina qehwebûna wê aravê, hezar şahid lazim bûn. Halbukî Johnny di got qey, ev qehwe ye û hem jî qehweyeke pirr qenc e. Ev yek ji wan çewtfahmkirinên wî yên jiyanê bû. Di emrê xwe de, tu carî qehweya rast ta'm jî nekiri bû. Bi nan re hinek jambonê cemidî hebû. Diya wî fincana wî ya qehwê careke din tije kir. Dema pariyê xwe yê taliyê avêt devê xwe, weke yekî ku digot ma hîn heye, li diya xwe dinihêrî. Ev nerînên tijepirs ji çavên diya wî ne reviyan.

Diya wî got:

"Pirrxuriyê meke, Johnny! Te para xwe xwar, xwuşk û birayên te, ji te piçûktirin."

Bersiva vê gotina diya xwe ne da. Wekî din jî ew ne yekî weha bi pirrpeyv bû. Dev ji bi çavên birçî li dora xwe nêrînê berda. Bi sebir bû. Tu gazin ji rewşa xwe nedikir. Qehweya xwe qedand. Bi pişta

destê xwe devê xwe paqij kir û ji bo çûyinê rabû ser xwe.

Diya wî xwe avêt ortê û got:

" Ka bisekine belkî ez bikaribim ji nên perçeyekî din derxim... Lê perçeyekî tenik..."

Di tevgera wê de, bilezbûna hoqebazekî xuya dibû. Ji nanê somûn, tu parî jê nekir. Lê weke ku jê kir da xuya kirin. dû re somûn xiste qutiya nên û ji herdu pariyên xwe yek dirêjî wî kir. Diya wî weha bawer dikir ku wê lawik xapandiye. Lê ev bilezbûna destên wê, ji çavên lêwik nereviya bûn. Lê car din jî, bê fedî rahişt nên. Ji ber nexweşiya kronîk ya diya xwe, weha bawer dikir ku ma'dê diya wî zêde nediçû xwarinê. Jinikê dema dît ku lawik nên zuha zuha dicû, qehwa xwe jî bera fîncana wî da û xwest îzah bike:

"Sebep çi ye, ez nizanim. Lê vê sibehê dilê min naçe tu tiştî."

Dengê zirav yê pîspîskekê, herdu jî rakir ser piyan. Jinikê li saeta ku di refikê de bû, nihêrî. Mîlên saetê pênc û nîv rê dida. Karkerên dinya fabrîkeyê yên mabûn, hîn nuh ji xew şiyar dibûn. Diya wî şalek avêt ser milên wî û şepqeyekî kevn, gemarî û rengjêçûyî da serê wî. Fitîla lampeya gazê daxist û got:

"Divê em baz bidin."

Bi destpelînkê rêya xwe dîtin û bi pêlikê daketin. Hewa paqij bû, lê serma hebû. Johnny bi temasa hewayê ricifî. Li ezmên stêrkan hîn dest bi wendabûnê nekiribûn. Bajar tarî bû. Hem Johnny û hem jî diya wî, dema ku dimeşiyan piyên xwe bi erdê re dikişandin. Mirov di got qey tu taqet di çongên wan de ne maye û lingên wan li dû wan dikşin. Piştî ku bi qasî panzdeh deqîqeyan meşiyan, diya wî li destê rastê zîvirî. Beriya ku di tarîyê de wenda biba, temiya xwe ya talî li lêwik kir:

"Tu dereng nemînî ha..."

Johnny tu peyv lê venegerand û rêya xwe dewam kir. Deriyên derve yên fabrîkeyê nuh vedibûn. Johnny jî ketibû nav girseya ku tarîtî dagirtibû. Dema ku di deriyê fabrîkê re derbas bû, dengê pîspîskê careke din jî hate bihîstin. Li aliyê rojhilat nihêrî û dît ku ro-

niyeke qels di ser baniyên xaniyan re xuya dibû. Beriya ku pişta xwe bidê û di nav hevalên xwe yên kar keve, hemû roniya rojê ya ku wî dît ewqas bû. Di nav rêza makîneyan de, cîhê xwe stand. Li ber wî, li jora sindoqa ku tije bobînên piçûk bû, bobînên mezin dizîvirîn. Bi tiliya girdikê û ya îşaretê serê ta digirt, bi destê xwe yê rastê jî bi aliyê din yê tayê bobîna piçûk digirt. Hereketên herdu destên wî jî diviyabû di eynî wextê de û bi lez bana. Dû re bi lez girêkeke tevnvaniyê davêtê û bobîn serbest ber dida.

Rojekê pesinî bû û gotibû:

"Ez di xew de jî dikarim girêkan bavejim."

Di vê gotina wî de, rastiyek hebû. Di hinek şevan de, xewnin ku mirov digot qey bi sedsalan berdewam dikin, didît. Di wan xewnan de girêkavêtin tu carî ne diqediyan. Hinekan jî bobînên ku vala dibûn bi derengî diguhartin. Ji ber vê yekê hem wext dihate wenda kirin û hem jî makîne li valahiyê dizîvirîn. Ji bo pêşîlêgirtina vê derengbûnê, nêrevanek li ser serê wan dima. Carekê, dema ku cîranê Johnny qelpî kir, nêrevan bi wî hesiya; guhê wî kişand, bi ser de qîriya û got:

"Li Johnny binihêre... ji bo çi tu ne wekî wî ye?"

Bobînên Johhny pirr zû vala dibûn û ev pesindanên indirekt jî qet tesîr lê ne dikirin. Hetta carekê... lê pirr zû de bû. Dema wekî nimuneyekî hate nîşan dan, li rûyê wî yê bêhîs tu guhartin xuya nebûbû. Karkerekî pirr baş bû. Wî vêya dizanîbû. Vêya ewqas jê re hatibû gotin ku êdî nema tu tesîr lê dikir. Wekî din jî ji bo wî tu qiymeta van pesindayinan tunebûn. Ne karkerekî bêqusûr, lê êdî bûbû makîneyeke bêqusûr. Ne ku tu carî çewtîtî nedikir. Lê gava di karê wî de, çewtîtiyeke peyda biba jî, ev wek çewtîtiya makîneyê ji ber çewtîtiya malzemeyan dihat. Bê çawa, ji qalibekî bê qusûr ya bizmaran, îmkana çewt çêkirina bizmarekî, çi qas mumkun ba, çewtîtîkirina wî jî ewqas mumkun bû. Di vê ya de, tiştekî ku mirov diviyabû lê ecêbmayî bima, tune bû.

Rojeke wî jî bê makîne derbas nebûbû. Mirov digot qey makîne

di hundurê wî de ye û ew bi makîneyê re mezin bûye. Beriya nuha bi duwanzdeh salan, li odeya bobînpêçandina vê fabrîkeyê, hedîseyeke piçûk çê bûbû. Dilê diya Johnny ji bîr çûbû. Jinik di nav girgira makîneyan de, li erdê dirêj kiribûn. Bangî du pîrekên bi emir hatibû kirin. Serekhoste jî alî wan kiribû. Piştî çend deqîqeyan, ji dervayî wan kesên ku di derî re ketibûn hundur, însanekî din jî li odeya tevnê peyda bûbû; ev Johnny bû. Johnny di nav girgira makîneyan de hatibû dinyayê. Pişikên wî hîn bi nefesa wî ya yekem re, hewa germ û bi rutûbet ya ku karkerên pembo hertim di nav de bûn, hate dagirtin. Di roja yekem ya jiyana xwe de, ji bo xwe ji tiftikê biparêze kuxuyabû. Ji wê rojê û heta nuha, ew kuxuk her berdewam e.

Lawikê ku li kêleka Johnny dixebitî, bi îske-îsk bêvila xwe kişand. Ji serçavên lêwik nefreta li hember nêrevanên ku bi awakî tehdîtkar lê dinihêrî, dahate xwendin. Lê hemû bobîn bi lezbûna herî talî dizîvirîn. Lawik ji bobînan re, hertim çêr dikir. Lê dengê wî pênc-şeş metreyan jî ji wî wê de ne diçû. Gume guma odeyê, ev deng weke dîwarekî dadiqurtand. Johnny guhê xwe qet ne dida vana. Evan bûyeran êdî tu tesîr lê nedikirin. Hingî hertim tekrar dibûn, bûbûn monoton. Gelek caran bûbû şahidê hedîseyên weha. Li gor wî; li hember nêrevan derketin, bi qasî li hember makîneyê derketinê bê feyde bû. Makîne ji bo xebatê û ji bo bi vê xebatê ve hinek kar bicîhanînê, hatinin çêkirin. Ev tişt ji bo nêrevan jî derbas dibû. Lê saet di 11-an de, li odeyê heyecanek hebû. Ev heyecan bi carekê li her derê belav bû. Lawikê bi lingekî yê ku li kêleka Johnny dixebitî, tev darên ku dixist binçengên xwe, ji nişka ve wenda bû. Mudurê Fabrîkeyê bi miroveki xort re kete hundur. Mirovê ku bi mudur re bû, taximekî kincê paqij û qutikekî qolakirî li xwe kiribû. Li gor bi sinifkirina Johnny, ev efendiyek bû û bêşik divê mufettîş ba jî. Dema ku di ber wan re derbas bû, bi awayekî sert li zarokan dinihêrî. Carinan jî disekinî û ji wan hinek tişt dipirsî. Dema ku dipirsî, diviyabû bi dengê hêl bipeyiviya. Ji bo ku dengê xwe bigihîne wan, ewqas

bang dikir ku rûyê wî bi awayekî xerîb diqermiçî. Kenê mirov pêdihat. Ew dezgeha li kêleka Johhny ya ku vala dizîvirî, ji çavên wî yên ku dilîztin, nereviya. Lê tu tişt negot. Dema ku çavê wî bi Johnny ket, di cîh de sekinî. Ji bo ku Johnny metreyekê ji makîneyê bi dûr bixe, bi milê wî girt. Lê milê wî bi dengekî ecêbmayî berda.

Mudurê fabrîkeyê ji heyecana keniya û got:

"Çi qas zeîf e."

Mufettîş got:

"Darikên çixaran. Li van çîpan binihêre. Bi vî zarokî re nexweşiya hestiyan heye. Hîn destpêk e, lê heye. Ger ew taliyê bi dayê nekeve jî, tu xelasbûna wî tuneye. Ji ber ku ew dê berê ji ber jana zirav bimre."

Johnny lê guhdar kir, lê tu tişt fahm nekir. Ji xwe nexweşiya ku dê di pêşerojê de derkeve pêşiya wî, ew qet alaqadar nedikir. Ji ber ku nuha nexweşiyeke xerabtir ya ku di şiklê mufettîşekî de wî tehdît dikir, li ber bêvila wî bû. Mufettîş ji bo dengê xwe bigihîne lêwik, xwe daqûl kir û di guhê wî de got, lê ya rastî bang kir:

"Li min binihêrî kurê min. Ez dixwazim ku tu ji min re rastiyê bibêjî. Tu çend salî yî?"

"çardeh salî "

Johnny derew kir. Wexta ev derew kir, ewqas bang kiribû ku hemû quweta pişikên xwe bikar anîbû. Bi vê bangkirinê re, kuxukeke zuha wî girt û tîftikên pembo yên ku bi pişikên wî ve zeliqî bûn, kil bûn. Mudur:

"Bi kêmanî 16 salî xuya dike."

Mufettîş:

"Ya jî 60 salî !"

Mudur got:

"Ew hertim weha xuya dike."

Mufettîş bi lez pirsî:

"Ev çiqas e ku ew weha ye?"

Mudur:

"Gelek sal derbas bûn. Lê ew tu carî kal nabe."

Mufettîş:

"Tu ji bo çi nabêjî ku ew tu carî nabe xort. Ez weha bawer im ku hemû emrên ku tê xuya kirin jî li vê derê derbas bûne."

Mudur got:

" Carinan dixebitî û carinan jî dev ji kar berdida," û ji nişka ve lê zêde kir: "Lê ev berî qebûlkirina vê qanûna nuh bû."

Mufettîş makîneya ku bi bobînên nîvpêçayî digeriya îşaret kir û pirsî:

" Ma ev makîne vala ye?"

Mudur:

" Weha xuya ye."

Mudur bangî nêrevan kir, ew makîne rê wî da. Bi ser wî de rabû, di guhê wî de tiştin gotin û dû re vegeriya ser mufettîş û îzah kir:

"Makîne vala ye."

Dema ku mufettîş û mudur derbas bûn û çûn, Johnny jî vegeriya ser karê xwe. Ji ber ku nexweşiya xwe bê qeza û bela derbas kiribû, hilma xwe berda û oxînek kişand û dilê wî rehet bû. Lê şensa lawikê bi lingekî, ne bi qasî ya wî bû. Mufettîşê ku çavên wî zîz dibûn, weke ku bi destên xwe xistibûyê, ew ji sindoqê kişand û derxist. Lêvên wî diricifîn. Rûyê wî wek rûyê yekî ku felaketek bi serê wî de hatiye, bû. Nêrevan qaşo ev cara yekem e ku lêwik dibîne, şaş mabû. Mudur şok derbas kiribû. Rûyê wî zer bûbû.

Mufettîş got:

"Ez vî lawikî nas dikim. Evı2 salî ye. Min ew îsal, sê caran ji fabrîkeyê qewirandiye. Ev dibe cara çaran."

Mufettîş li lawikê ku bi lingekî bû, zîvirî û got:

"Ka te soz dabû min ku tu dê biçûya dibistanê?"

Çavên lêwik tije hêsir bûn û ji nişka ve weha got:

"Ji bo Xwedê mufettîş beg, du zarokên me mir in. Em maleke pirr feqîr in."

Mufettîş weke ku lêwik bi sûcê cînayetê îtham dikir, pirsî:

"Tu ji bo çi weha dikuxe?"

Lawikê bi lingekî li hember vê îthamkirinê, bi awayekî xweparastinê bersiv da:

"Tiştekî min tuneye, mufettîş beg. Min hefteya berê hebekî serma girtibû. Hemû ewqas e."

Lawik bi mufettîş re ji odeyê derket û mudur jî nerazîbûna xwe diyar kir û da dû wan û derket. Dîsa hewayeke monoton, hundurê odeyê dagirt.

Sibeheke dirêj û paşnîvrojeke ku ji wê jî dirêjtir qediya û pîspîska ku wexta qedandinê diyar kir, lê ket. Dema Johnny ji deriyê fabrîkayê derket, tarîyê xwe ji zûde bera erdê dabû. Di navbeyna ketin û derketina wî ya fabrîkayê de, tavê li ezmana nêrdewaneke zêrînî danîbû û germahiya xwe ya dilovan li dinyayê belav kiribû. Dû re nizm bûbû û li aliyê rojava, di nav ewrên ku ji ber baniyên xaniyan ve, perçe perçe dihatin xuyakirin de, wenda bûbû.

Li malê dahnekî xwarinê tenê hebû ku hemû endamên malbatê hazir dibûn. Ew jî şîv bû. Johnny û xuşk û birayên wî, tenê di vî dahnê xwarinê de, li ser sifreyekê dihatin ba hev. Ev bihevrebûn ji bo Johnny wek herbê bû. Wî xwe kal lê gelekî kal(ixtiyar) didît û xuşk û birayên xwe jî pirr ciwan didît. Wî nikarîbû tehamulî bêkêrî û bêfesaltiya wan bikira. Ji xwe, ji wan fahmkirin pirr zehmet bû. Zaroktiya wî gelekî li paş mabû. Ji ber bêfesaltî û rûşuştîbûna wan, xwe pirr aciz dikir û bûbû weke kalekî asabî. Di demên weha yên ku pirr diqeherî de, xwe bi fikra ku rojekê ji rojan ewê jî ji bona nanê xwe bixebitin, teselî dikir û xwarina xwe bê deng dixwar. Wî dê teb'ên wan yên ku ne baş bûn, ji wan bibirya û wan jî weke xwe bikira mirovên cidî û giran. Wek hemû mirovên din, Johnny jî xwe pîvan dihesiband û hemû kaînat li gor vê pîvanê dinirxand.

Dîya wî li ser xwarinê tiştên xwe yên berê, yanî gotina xwe ya ku " Çi ji destên min tê, ez ji bo we dikim" tekrar dikir. Xelasbûna wê xwarina ku ji xwe têra wan nedikir, pêşiya van gotinan birrî. Johnny kursîya bin xwe bi paş de dahf da û ji sifreyê rabû. Li ber

deriyê odeya raketinê û deriyê ji derve bi awayekî dudilî sekinî û taliyê jî derket derve. Ji malê dûr neket. Li ber devê derî rûnişt. Çongên xwe ber bi jorê kişand, bi milên xwe yên teng daqûlî pêş bû, enîşkên xwe danî ser çongên xwe û destên xwe da ber rûyê xwe. Li tu tiştekî ne difikirî; rûniştibû û îstirahat dikir. Zihnê wî di xew re çûbû. Xuşk û birayên wî li derve bi zarokên din re dilîztin û bi şematakê li dora Johnny diçûn û dihatin. Lampeya li qoziyê lîstika wan ronî dikir. Wan dizanîbû ku Johnny zû diqehere û asabî dibe. Lê hewesa macerayê wan ber bi wî ajot. Li pêşiya wî bi destên hev girtin, laşên xwe bi aheng kil kirin û dest bi dîlokeke bi qerf kirin. Johnny dest bi çeran kir. Ev çer ji hosteyê fabrîkeyê hîn bûbûn. Lê ev çêr bê feyde dîtin, cidiyeta xwe anî bîra xwe û ket nav bêdengiyekê.

Birayê wî yê ku li pişta wî, Will hîn nuh ketibû sala dehan. Will serokê zarokan bû. Johnny ji wî qet hez nedikir. Ji piçûkaniya xwe û vir de, wî her li Will niheriye û temenê(emrê) xwe ji bo alîkariya wî amade kiriye. Will ji dêlba ku rabûya û rûnişra, jê re dûa bikira, nankorî dikir. Johnny di wextê berê de, ji zaroktiya xwe tu xêr nedîtibû. Wextên wî yên lîstinê, bi xwedîkirina Will re derbas bûbû. Will wê demê zarokekê pêçekê bû. Dîya wî wê demê jî weke nuha, bi rojê li fabrîkayê kar dikir. Ji ber vê yekê, Johnny ji will re hem hinek dêtî û hem jî hinek bavtî dikir. Weha xuya bû ku Will ji vêya baş îstifade kiribû. Laşê wî saxlem xuya dikir. Têra xwe dagirtî bû. Di bejna Johnny de bû. Lê jê qelewtir û girantir bû. Mirov di got qey jîndarî û xwîna yekî ketiye damarên yekî din. Ev ji aliyê ruhî jî weha bû; Johnny westiyayî bû, bêdeng bû û zuha mabû. Lê birayê wî yê piçûk heta ku tu bibêje, li ser xwe bû û di cîhê xwe de nedisekinî. Dîloka biqerf her çû bilind bû.

Will dema ku dans dikir, hêdî hêdî ber bi wî de dihat, xwe daqûl dikir û zimanê xwe jê re derdixist. Destê Johnny ji nişka ve dirêjî pêş bû û hişk bi qirika Will girt. Kulmika xwe ya destê din jî li orra bêvila yê din xist. Ev kulmikeke qels bû û bi hêrs hatibû avêtin. Lê

bi qasî ku birîndar bike sert bû. Qêrîna lêwik vêya îspat dikir. Qêrîn bi zarokên din ketibû. Xuşka Johnny, Jennie ber bi malê baz da. Johnny, Will bi paş de dahf da û pihînek li qapaxa çonga wî xist û dû re wî ser dev de avêt nav heriyê. Heta ku rûyê wî çend caran di heriyê de neda jî dev jê berneda. Pirr derbas nebûbû, dîya wî bi rûyekî xemgîn û bi xezebekê hat. Dîya wî bi ser wî de rabû. Johnny jî li hember vêya weha got:

"Ji bo çi ew bela xwe di min de dide? Ji bo çi min di halê min de nahêle? Ma tu nabînî ku ez westîyayî me?"

Will bi rûyê herîbûyî û bi çavên bi hêsir, di nav destên dîya xwe de, bang kir:

"Ez jî bi qasî te mezin im. Ez dê hîn jî mezin bibim. Wê gavê ez dê rê te bidim, bê ka dinya çawa ye... Tu bisekinî, tu dê nuha bibînî!"

Johnny:

"Ger tu ewqas mezin be, ji xwe re karekî bibînî. Di eslê xwe de, sûcê te bi xwe jî ev e... Divê tu bi kêrî tiştekî bê. Ji te re kardîtin jî wezîfeya dîya te ye."

Dîya wî li hember vê gotina wî derket û got:

"Lê ew hîn pirr piçûk e. Ma emrê wî çi ye!"

Johnny:

" Dema ku min dest bi kar kir, ez ji wî piçûktir bûm."

Johnny devê xwe vekir û dikira ew neheqiya ku li wî hatibû kirin, bigota. Lê devê wî bi şîrmaqekê hate girtin û bi awayekî bê hêvî li ser paniyên xwe zîvirî, kete hundur û çû odeya xwe ya raketinê. Deriyê odeyê ji bo germahiya ji metbexê tê, tesîra xwe lê bike, vekirî hatibû hiştin. Johnny di nîvtariyê de, kincên xwe ji xwe dikir. Di eynî wextê de, axaftina dîya xwe û ya pîreka ku cîranê wan bû jî dibihîst. Dîya wî digirîya. Axaftina wê bi bêvilkişandineke pirr bêruh dihate qut kirin. Dengê dîya wî dihat guhê wî:

"Ez nizanim bê çi bi Johnny hatiye. Wî berê, tu carî weha nedikir. Melekekî piçûk û bi sebir bû."

Dû re dest bi parastina wî kir:

" Ew di eslê xwe de lawikekî pirr baş e. Bi her awayî xwe daye kar. Di emirekî pirr piçûk de, dest bi kar kir. Lê çi gunehê min heye... Ez bi vêya bawer im ku çi tiştên ku ji destên min tê, ez dikim."

Hîn jî dengên îsk îsk û bêvilkişandinan ji metbexê dihat. Dema qapaxên çavên wî hatin girtin, di ber xwe de weha got:

"Ha, bila tu vêya zanibî... Tab'î ez bi ruh û can xebitîm."

Dîya wî serê sibehê, wî dîsa kil kir û ji xewa şêrîn rakir. Dû re dîsa ew taştiya ku qula diranekî danedigirt; di tarîtiya reş de rêwîtî û tîrêjên qels yên roja ku berî Johnny piştа xwe bidê û di derîyê fabrîkayê re têkeve hundur, di ser baniyên xanîyan re xuya dibûn...

Îroj jî wek hemû rojên din bû. Hemû roj wek hev bûn...Di jiyana wî de tiştê ku mirov jê re karîba bigota guhartin, hew di dema ku ji karekî derbasî karekî din dibû, an dema ku nexweş diket, peyda dibû. Ji şeş saliya xwe û vir de, ji Will û ji xuşk û birayên xwe yên din re dê û bavtî kiribû. Dema ku heft salî bû ketibû fabrîkayê û dest bi karê bobîn pêçandinê kiribû. Di heşt salîya xwe de, derbasî fabrîkeyeke din bûbû. Karê wî yê nuh pirr rehet bû. Hemû tiştên ku wî dikir ev bû; Wî ji bo ku çemê qumêş rast biherike, bi darekî piçûk ew îdare kir. Ev çemê qumêş ji zikê makîneyê dihat, di ser sîlîndîreke sorkirî re derbas dibû û diçû alîyê din û rêya xwe dewam dikir. Ew hertim li eynî cîhî rûdinişt; Li cîhê ku roj nedidît û di bin lampeyeke gazê ya ronîlerzokî de, bûbû perçeyekî mekanîzmayê. Johnny tev germahiya bi mezeloq jî ji karê xwe memnûn bû. Ji ber ku hîn pirr ciwan bû û gelek xeyalên wî hebûn. Dema ew qumaşên ku dûkel jê diçûn, di ber wî re derbas dibûn, ew diket nav xeyalan, hem jî çi xeyalên harîka. Lê karê wî tu huner nedixwest. Aqil bikaranîn ne pêwîst bû. Ji ber vê yekê jî aqilê wî bi wextê re tembel bûbû, êdî di xew re diçû û xeyaldîtin jî hêdî hêdî kêm dibû. Ji xwe di hefteyekê de, ancax du dolar diketin destên wî. Ev herdu dolar, sembola ferqa di navbeyna feqîriya kronîk û birçîbûna dijwar de bû.

Lê dema ku emrê wî bû duwanzdeh, ji kar hat derxistin. Sedema vêya sorik bû. Piştî ku rehet bû, di fabrîkayeke caman de dest bi kar kir. Li vê derê pereyên ku diketin destên wî, bêtir bûn û karê wî huner jî dixwest. Ji ber ku li gor hesabê perçeyan, mûçe(maaş)distend, çiqasî zêde kar bikira, pereyên ku diketin destên wî jî ewqas zêde bûn. Ev kar karekî teşwîqkar û bi hereket bû. Johnny bi tesîra vê teşwîqê bûbû karkerekî baş. Kar gelekî hêsan bû. Johnny tapayên cam bi şûşeyên piçûk ve girêdida. Hertim gilokeke qinab pê re hebû. Ji bo ku bikariba bi herdu destên xwe kar bikira, şûşe dixist nav çongên xwe. Ji ber ku dema rûdinişt, xwe bi ser çongên xwe xwar dikir û duqatî dibû, xûz bûbû û rojê deh saetan ta'de li kafesa sînga wî dihat. Rûniştina weha ji bo pişikan qet ne baş bû. Lê wî rojê sê sed duzîne şûşe girê didan û ji bo vêya jî tu rêyeke din tunebû. Mudur bi wî gelek dipesinî. Ji bo xelk wî bibîne, wan dawetî fabrîkayê dikir û Johnny nîşanî wan dida. Di hundurê deh saetan de, sê sed şûşe ji destên wî derdiketin. Ev îspata ku ew gihaştibû mukemeltiya makîneyê bû. Hemû hereketên nepêwîst ji dervayî kar hatibûn hiştin. Her hereketa milên wî yên zitav û her livandina adaleyên tilîkên wî yên zitav, bi lez û bi aheng bû. Ji ber ku wî hertim di nav stressê de kar dikir, pirr asabî bûbû. Adaleyên wî bi şev diciviyan ser hev û bi roj, ji xwe tu firseta xwerehetkirinê û îstirehetkirinê nedidît. Hertim bi stress bû û adaleyên wî jî hey dicivîyan. Rûyê wî bi wextê re çilmisî bû. Kuxuka ku ji ber lîfên bi pişikên wî ve zeliqî bû, pê re peyda bûbû, her diçû girantir dibû. Dema ku pişikên wî serma girt û bi zatûreyê ket, karê xwe yê di fabrîkeya caman de jî wenda kir. Nuha vegeriyabû ser karê xwe yê ku cara yekem di fabrîkaya lîfan de, bi bobînan dest pêkiribû. Lê vê carê terfîkirin li pêşiya wî bû.

Karkerekî baş bû. Piştî demeke din, ew dê derbasî beşa qolayê û dû re jî odeya dezgeha tevnê biba. Ji vêya zêdetir bilind nedibû. Tiştên ku ji vêya pê ve zêde biba, bereketa kar bû. Makîne ji dema ku cara yekem, ew ketibû kar bileztir dixebitîn. Lê serê wî hêdî di-

xebitî. Êdî xeyal-meyal dîtin tunebû. Halbûkî salên wî yên destpêkê, bi xeyalan dagirtî bûn. Carekê evîndar bûbû. Ev evîn, dema ku bi darekî rêya qumaşê ku di ser sîlîndîrê germ diherikî, rast dikir, pê re peyda bûbû. Keçika ku dilê wî ketibûyê, keça mudurê fabrîkeyê bû. Keçik ji wî bi emirtir bû. Hema hema jinek ciwan bû.

Johnny tev de şeş caran, ew jî ji dûr ve ew dîditibû. Lê bila weha ba, dê çi zerarê wê heba? Li ser rûyê qumaşê ku di ber wî re diherikî, planên xweş yên pêşerojên çêdikir, di kar de serkevtinên mûcîzeyî bi dest dixist, makîneyên nehatine dîtin îcat dikir, îdareya fabrîkeyê dixist destên xwe, dibû patronê fabrîkayê û dû re keçik himbêz dikir û wê ji enîya wê maçî dikir. Lê vana pirr li paş man. Ji bo evînê pirr kal û westiyayî bû. Keçik zewicî bû û çûbû. Aqilê wî ketibû xewê. Lê çi dibe bila bibe, ev ji bo Johnny bûbû tecrubeyeke pirr baş. Bê hinek jin û zilam çawa li rojên xwe yên ku dema ji perîyan bawer dikirin, dizîvirîn û difikirîn, Johnny jî weha difikirî. Wî ne ji perîyan û ne jî ji Noel bawer dikir. Lê wî ji dil baweriya xwe bi xeyala pêşeroja dibişirî ya ku li ser çemê qumaşê ku dûkel jê diçû çêdikir, anî bû. Jiyanê ew zû kiribû zilam. Di heftsalîya xwe de, dema ku heqê xwe yê hefteyê stand, dest bi zilamtiyê kiribû. Wê gavê hîseke serxwebûnê ketibû dilê wî. Têkiliyên wî yên bi dîya wî re hatin guhartin. Li vê dinyayê bi kêrî tiştekî dihat. Êdî pere diketin destên wî û nan û xwarin dianî malê. Ji ber vê yekê, ew jî bûbû wek dîya xwe. Dema bû yanzdeh salî û dû re şeş mehan di wardiyeya şevê de kar kir, êdî tam dest bi çaxa xwe ya zilamtîyê kiribû. Tu zarok piştî karê wardiyeya şevê, zarok namîne. Di jiyana wî de, yek-dû hedîseyên mezin çêbûbûn. Ji vana yek, dema ku dîya wî alûcê Kaliforniyayê kirîbû û ya duduyan jî dema dîya wî krema çêkiribû, hatibû meydanê. Evana bûyerên mezin bûn. Dema Johnny vana dianî bîra xwe, dilê wî xweş dibû. Di wan deman de, dîya wî behsa şêranî çêkirinê kiribû. Li gor dîya wî navê wê " Girava ku avjeniyê dike" bû û "ji krema jî xweştir" bû. Johnny dema li ser sifreyê rûdinişt, hertim bi hesreta "girava ku avjeniyê dike" bû. Lê bi wextê re

ew jî xist nav îdealên xwe yên ku mirov qet nikare bigihêjê. Rojekê, li peyarêkê 25 sentê zîv dît. Tev ku taliya wê bi dilêşî qediya bû jî ew jî yek ji wan hedîseyên mezin yên jiyana wî dihat hesibandin. Dema ku çavê wî li biriqandina pereyê zîvî ket, berî ku ji erdê rahêjê, wî wezîfeya xwe ya di rewşên weha de zanîbû. Li malê wek hertim xwarin tunebû. Bê çawa heqê hefteya xwe ya ku di her roja şemîyê de distand, dibir malê, diviyabû ev pere jî raste-rast bibira malê. Rastiya di vê rewşê de pirr eşkere bû. Lê wî tu rojekê jî pereyên xwe, bi xwe xerc nekiribû. Tew dilê wî jî ewqas diçû şekir!

Dema ku behsa şekir dibû, ji xwe dilê wî ji bîr diçû. Ancax di cejn-mejna de, devê wî bi şekir dibû. Li xapandina xwe negeriya. Wî dizanibû ku tiştê ew dike, guneh e. Lê bi zanebûn, bi panzdeh sentên ji wî pereyî, ji xwe re şekir kirî. Deh sentê ku ji ber ma jî ji bo ziyafeteke din hilanî. Lê ji ber ku hîn fêrî pere bi xwe re gerandinê nebûbû, deh sentê xwe wenda kir. Ev pere tam jî di dema ku bi wîcdanê xwe re ketibû muhasebeyekê, hatibû wenda kirin. Vêya wek cezayeke îlahî hate dîtin. Ji ber nêzîkbûna dehşet û xezeba xwedê, tirsek ket dilê wî. Xwedê wî dîtibû. Û xwedê berî ku ew gunehê xwe tam bike, ew ceza kiribû. Dema ev hedîse, wek cînayeta herî mezin ya di jiyana xwe de, bi bîr dianî, wîcdanê wî diêşiya û ji nû ve diket nava êşên giran. Tiştê wî yê dizî ku ji ber fedî dikir, ev tenê bû. Bi poşmanî li vê hedîseyê difikirî û dilê wî dişewitî. Awayê xerckirina bîst û pênc sentan ne li gor dilê wî bû. Wî dikarîbû ew bi awakî hîn baştir xerc bikira. Ger wî zanîba ku xwedê di mesela cezadanê de, dê ewqas bi lez hereket bikira, wî dê temamê bîst û pênc sentê xwe bi derbekê re xerc bikira. Di xeyala xwe de, ew bîst û pênc sent hezar carî xerc dikir û di her xerckirinê de, ta'mek baştir jê distend. Bîranîneke wî ya din hebû. Bîranînek ku pirr baş nedihat bîra wî. Lê dîsa jî bi lingên bêmerhamet yê bavê wî, di kûrahiya ruhê wî de mabû. Ji tiştekî xuya bêtir, dişibiya kabûsekî. Tu ferqa vê bîranînê, ji xewna mirovê ku di xewa xwe de, ji derekê digindire û dikeve nava bapîrên xwe, tunebû. Ev bîranîn di bin ronahiya rojê

de, dema ku ew şiyar bû, nedihat bîra wî. Bi şev, dema ku tam wê di xew keta, dihat bîra wî û xewa wî direvand û ew şiyar dikir. Di destpêka vê xewna ku mirov nexweş dikir de, Johnny digot qey ew li binya nivînê xwe, çepûrast dirêjkirî ye. Di nav cîha de, weke ku xeyala dê û bavê xwe di nav xumamê de didît. Wî qet nizanûbû ku bê bavê wî dişibiya çi. Tiştek tenê zanîbû, ew jî lingên bavê wî yên bêmerhamet û wehşî bû. Hemû bîranînên wî yên destpêkê, bi bavê wî re derbas bûbûn. Lê tu bîranînên wî yên aîdî salên dawiyê tunebûn.Hemû roj dişibiyan hevdû. Do an sala çûyî, wek hezar salî bûn... An jî wek deqîqeyekê... Tu hedîse çênedibû. Tu bûyera ku bûbûya nîşana herikandina zemên tunebû.

Zeman nedimeşiya. Li cîhê xwe sekinî bû. Bi tenê makîneyên ku dizîvirîn, hereket dikirin. Makîne tev ku hertim zûtir û wek gulê dizîvirîn jî nediçûn tu deveran. Gava temenê wî bû çardeh, li beşa qolayê dest bi kar kir. Ev bi serê xwe hedîseyek bû. Nîhayet tiştekî ku ji dervayî xewa şevekê an mûçeyê hefteyekê, bi bîr bianîya çêbûbû. Ev destpêka demeke nuh bû. Hedîseyeke ku demeke dîrokê tayîn dikir... Weke olîmpiyadeke makîneyan bû. Ji devê wî hertim ev peyv diherikîn:

"Dema ku ez derbasî beşa qolayê bibim," an "paşê" an jî "beriya ku ez derbasî beşa qolayê bibim."

Salawexta xwe ya şanzdehan li beşa tevnê û li dezgehê pîroz kir. Ev cîha cîhekî teşwîqkar bû. Ji ber ku dîsa li gor hesabê perçe kar dikir. Li vê derê jî kesek nikaribû bigihişta wî. Çunkî dezgehan wî baş strabûn û jê makîneyeke baş derxistibûn. Di dawiya meha sisiyan de, du dezgeh; dû re sê û herî talî jî çar dezgeh bi hev re dixebitandin. Di dawiya sala duduyan de, ji tevnvanekî hoste wêdetir, ji karkerekî wasat du qat zêdetir qûmaş çêdikir. Her ku digihişt tixûbê herî bilind yê perestendinê, tiştên ku dihatin malê jî zêdetir dibûn. Lê pereyên ku diketin destên wî, tu carî têra ihtiyaciyên wan nedikir. Zarok mezin dibûn. Hîn bêtir dixwarin. Diçûn dibistanê. Ji bo pirtûkên dibistanê jî pere lazim bû. Tiştê xerîb ew bû ku

Johnny çiqas bi lez bixebitiya, fiyetê hertiştî jî ewqas bi lez zêde dibû. Tew kirêya xanîyê ku ji ber bêtamîriyê tu nemabû biketa jî zêde bûbû. Bejna wî êdî dirêj bûbû. Lê bejna wî ya dirêj, ew zeîftir û ziravtir dida xuya kirin. Bêtir asabî bûbû. Bi vê asabiyetê re xeydokîbûna wî û bêtehamuliya wî jî zêde bûbû. Zarokan, piştî ku çend caran dersa xwe ji Johnny stendin, êdî jê ditirsiyan.

Bi dîya wî re, li hember vê quweta wî ya pere karkirinê, hurmetek bi tirsê re tevlihev peyda bûbû. Ji bo Johnny tu ta'ma jiyanê tunebû. Wî roja ku dinya ronî dikir, tu carî nedidît. Bi şev, ji dervayî îradeya xwe, ji nişkave ji xew vediciniqî û şiyar dibû. Di wextê mayî de jî kar dikir. Şûûra wî dişibiya ya makîneyekê. Ji dervayî vêya serê wî vala bû. Îdealên wî tunebûn. Xeyalek wî tenê hebû; Wî di got qey ew sibehan, qahweyeke bi ta'm vedixwe. Ew heywanekî kar bû. Jiyana wî ya fikrî qet tunebû. Lê di kûrahiya mejiyê wî de, li deverek ku wî jî nizanîbû, her hereketa destên wî û rakşandina adaleyên wî, ji bo her saeta xebatê tên pîvandin, wezinandin, hilbijartin û haziriya ji bo gelek hereketên pêş ku hem wî hem jî dinya wî ya piçûk ecêbmayî dihişt, dihate kirin. Di dawiya biharê de, şevekê dema ku ji karê xwe vegeriya, ji betilbûna xwe ya hertim bêtir betilî xuya dikir. Gava ku li kêleka maseyê rûnişt, atmosfereke weke ku mirov li bende tiştekî bû, hebû. Lê wî vêya ferq nekir. Wî di nav bêdengiyekê de, lê wek makîneyekê dest bi xwarinê kir. Çelp çelpa devê zarokan bû û digotin:

"Immm; ox".

Lê Johnny ew nedibihîstin jî. Dîya wî di talîyê de, bi awakî bêhêvî jê pirsî:

"Ma tu dizanî ku tu çi dixwî?"

Johnny berê li xwarina ku li ber xwe bû û dû re jî li dîya xwe nihêrî.

Jinikê bi kêf got:

"Girava ku avjeniyê dike".

Johnny got:

“himmm”.

Zarokan bi hev re bang kirin:

“Girava ku avjeniyê dike”.

Johnny dîsa got:

“himmm”.

Piştî ku du-sê parîyên din jî xwar, got:

“Ez bawer im ku ez vê êvarê ne birçî mim.” Kevçî danî, kursiya xwe paş de dahf da, bi awakî westiyayî ji sifreyê rabû û got:

“Ez dê biçim razêm.”

Gava ku li metbexê dimeşiya, lingên xwe girantir dikşand. Kinc ji xwe kirin, karekî ku quweteke mezin dixwast û bê feyde bû. Gava bi ferek sola xwe, çû ser cîhê xwe digirîya. Di mejiyê xwe de, tiştekî ku her diçe bilind dibe û gûr dibe, hîs kir. Wî di got qey, tilîkên wî yên zirav bi qasî zenda destê wî xuya dikir. Di serên tilîkên wî de, hîsek xerîb û nediyar wek ya di mejîyê wî de, hebû. Hemû hestiyên wî diêşiyan. Êşê xwe li hemû laşê wî belav kiribû. Di hundurê serê wî de, bi mîlyonan dezgeh dest bi girgir û çîr-çîrkê kiribûn. Hemû ezman bi mekîkên ku difiriyan, hatibû dagirtin. Ev mekîk di nav stêrkan de, çixêzên tevlihev çêdikirin û bi vir de û bi wir de diçûn. Johnny bi tena serê xwe, hezar dezgeh dixebitandin. Her ku bilezbûna dezgehan zêde dibû, mejiyê wî jî bi lezbûneke zêde ji hev vedibû û dibû tayekî ku li wan mekîkê difiriyan, gerandî.Sibehê neçû kar. Ew bi hezar dezgehên ku di serê wî de hebûn ve, meşgûl bû. Dîya wî berî ku biçe kar, ba doktorekî kiribû. Doktor got ku; ew bi grîpeke giran ketiye. Jenny jê re hemşîretî kir û tembîhên doktor bi cîh anîn. Ev tayeke weha dijwar bû ku heta Johnny kincê xwe li xwe bikira û li odeyê li ser xwe bimeşiya, diviyabû hefteyek derbas bûbûya. Li gor gotina doktor, wî dê piştî hefteyekê kariba dest bi karê xwe bikira.

Roja yekşemê, serekhoste hat ziyareta wî. Ji dîya wî re got ku di beşa tevnê de, tevnvanê herî baş Johnny e. Karê wî li bende wî bû. Piştî roja duşemê, di hundurê hefteyekê de dikarîbû vegeriya ser ka-

rê xwe. Dîya wî got:

"Johnny ma tu ji bo çi spasî wî nake?"

Dû re li ser navê wî ji mêvanê xwe, doza lêbihurînê kir:

"Divê tu li qusura wî neneri. Ew gelek li ber nexweşiyê ketiye, hîn hişê wî nehatiye serê wî."

Johnny rûniştîbû. Qopika pişta wî derketibû û li erdê dinihêrî. Piştî çûyina serokhoste jî heta demeke dirêj weha rûniştî ma. Derve germ bû, piştî nîvro derket derve û li ber derî rûnişt. Catinan lêvên wî kil dibûn. Mirov digot qey di nava hesabên bêser û ber de wenda bûye û çûye. Sibeha din, piştî ku dinya baş germ bû, dîsa derket û li ber derî rûnişt. Îcar ji bo hesabên xwe ji cîhê ku mayî betdewam bike, pênûs û kaxiza wî jî hebûn. Hesabên pirr tevlihev û ecêb çêkir. Nîvro dema ku Will ji dibistanê vegeriya, jê pirsî:

"Piştî milyonê çi tê?... Û çawa tê nivîsandin?"

Wê rojê, hesabê xwe piştî nîvrojê qedand. Dîsa herroj derdiket derve û li ber derî rûdinişt, lê êdî bê pênûs û kaxiz bû. Hogirî dara li hember rê bûbû. Herroj bi saetan lê hûr dibû. Dema ku ba hemû guliyên wê kil dikir û pelên wê tev li hev dikir, întresa wî zêdetir dibû. Di hemû hefteyê de, bi xwe re ketibû nava sohbeteke kûr û dûr. Roja yekşemê, dema ku li ber derî rûniştibû, bi dengê hêl çend caran keniya. Dîya wî ya ku ji zûde kenê wî nedîtibû, pirr şaş mabû. Jinik di berbanga sibehê de, ji bo şiyarkirina wî çû ba wî. Ji ber ku Johnny ev hefteyek bû ku têra xwe raza bû, bi hêsanî şiyar bû. Qet di ber xwe de neda. Gava ku dîya wî lihêf ji ser wî kişand jî hişk pê negirt. Ew bêdeng radiza. Dîsa bi eynî bêdengiyê dipeyivî:

"Tu feydeya wê tuneye, yadê".

Dîya wî di got belkî hîn gêjiya ku ji ber xewê, ji ser xwe neavêtiye, got:

"Tu dê dereng bimînî."

Johnny got:

"Ez şiyar im, yadê. Min ji te re got ku tu feydeya wê tuneye. Ya baş, min rehet bihêle. Ez ranabim."

Dîya wî bang kir:
"Lê tê ji kar bê avêtin."
Johnny bi dengekî bêdil û xerîb dubare kir:
"Ez ranabim."
Wê sibehê jinik jî neçû karê xwe. Ev nexweşî, ne ji wan nexweşiyên ku wê pêdizanîbû. Wê ji bidestanpeyvîn û tayê fahm dikir. Lê ev dînitiyeke eşkere bû. Lihêf dîsa avêt ser Johnny. Dû re Jennie şand pê doktor. Gava ku doktor hat, Johnny di xewa şêrîn de bû. Li hember şiyarbûna xwe derneket. Ji bo li nabzê guhdarkirinê jî tu tişt negot.
Doktor got:
"Tu tiştekî wî tuneye. Pirr zeîf bûye, hemû ev e. Tenê hestî û çerm maye..."
Dîya wî ji nişka ve got:
"Ew hertim weha ye"
Johnny got:
"Yadê, êdî here. Min bihêle ku ez xeweke rehet bikim."
Johnny bi dengekî mulahîm û şêrîn dipeyivî. Bi eynî mulahîm û şêrînbûnê, xwe li ser kêlekê zîvirand û raza. Saet di dehan de, rabû ser xwe û kincên xwe li xwe kir, çû metbexê. Dîya wî li wê derê bû. Taswasekê ew girtibû. Johnny got:
Yadê, ez diçim. Ez dixwazim, xatirê xwe ji te bixwazim."
Jinikê ji nişka ve berdilka xwe avêt ser çavên xwe û dest bi girî kir.
Johnny bi sebir li bende wê sekinî. Jinikê bi îsk îskî got:
"Tiştê ku ez jê ditirsiyam, hate serê min."
dû re berdilka xwe ji ser çavên xwe avêt û bi awakî bi tirs û bi meraq li lawê xwe nihêrî û jê pirsî:
"Bi ku de?"
Johnny:
" Ez nizanim... Kî derê dibe, bila bibe."
Gava ku dipeyivîn, dara li hember rê, bi tîrêjên zelal di xeyala Johnny de, bi ruh hat. Mirov di got qey di bin qapaxên çavên wî de

bû û gava ku bixwesta dikarîbû bibîne. Dîya wî bi dengekî lerzokî pirsî:

"Lê karê te?"

Johnny:

"Ez ji îro pê ve, nema kar dikim."

Qêrîn bi dîya wî ket û got:

"Haho xwedêyo! Weha nebêje!"

Van gotinên Johnny, ji bo jinikê wek sixêfan bû. Dîya Johnny wek jina ku dibihîse lawê wê xwedê înkar dike, şok derbas dikir. Hema hema bi hişkahiyeke tawanbarkar pirsî:

"Tu bi ya kîjan şeytanî dikî?"

Johnny:

"Reqem... Reqem... Min vê heftê gelek hesab çêkirin. Hesabên weha ku dê aqilê te bisekine."

Jinikê bêvila xwe kişand û got:

Çi alaqa çûna te bi vêya heye, ez fahm nakim."

Johnny bi sebir keniya. Stress û asabiyeta Johnny çûbû û di şûna wan de sakîntiyek peyda bûbû. Dîya wî li vêya ecêbmayî ma. Taswasa dîya wî her diçû, zêdetir dibû.

Johnny got:

"Li min binihêrî û guhdar bikî. Ez pirr westiyayî me. Çi min diwestîne? Hereketkirin. Ez ji roja ku hatime dinyayê û vir de hereket dikim. Ez ji hereketkirinê westiyam. Ez êdî nema hereket dikim. Tê bîra te, dema ku ez di fabrîkaya caman de dixebitîm? Min rojê sê sed duzîne kar derdixist. Min hesab kir ku ez ji bo her şûşeyekê deh hereketên cîhê dikim. Vêya di rojekê de, dike sî û şeş hezar hereket. Di deh rojan de, sê sed û şêst hezar hereket. Ev di mehê de, bû mîlyonek û heyştê hezar hereket? Hadê em bêjin, heyştê hezarî bavêje, bila here..."

Bi dilpakî û rehetiya xêrxwazekî dipeyivî."

Belê heyştê hezarê wê bavêje, di mehekê de mîlyonek hereket dimîne. Ev jî di salekê de, dike duwanzdeh mîlyon hereket. Min di

tevnvaniyê de, ji vêya du caran zêdetir hereket dikir. Ma ev jî ji te re bû, bîst û pênc mîlyon hereket? Wekî din jî ez dibêjim qey ev mîlyon sal in ku ez di halê hereketkirinê de me. Min vê hefteyê qet hereket nekir. Bi saetan, min tilîka xwe jî tev ne livand. Ez ji te re bibêjim; Mirov bêî ku tiştekî bike, bi saetan li vê derê rûne jî nikare jê têr bibe. Ez berê tu carî ewqas kêfxweş nebûbûm. Min ji bo vêya tu carî wext nedîtibû. Min hertim hereket dikir. Ezê êdî nema tu tiştekî bikim. Ezê tenê rûnim, dîsa rûnim, îstirahat bikim, dîsa îstirahat bikim û dû re hinekî din jî îstirahat bikim."

Jinikê bi xemgînî pirsî:

"Baş e, lê Will û zarokên din wê çawa bibin?"

Johnny:

" Erê ha, Will û zarok."

Lê di dengê wî de tu qehr tunebû. Wî ji mêj de dizanîbû ku dilê dîya wî bi ser birayê wî yê piçûk ve bû. Lê êdî vêya wî zêde aciz nedikir. Wî nema guh dida tu tiştî. Guh nedida vêya jî.

"Ez dizanim bê tu ji bo Will planên çawa difikire, yadê. Nîyeta te ev e ku tu wî bide xwendin, bike hesabdar û bike zilam. Lê êdî feyde nake. Min dev ji kar berda. Ji îro pê ve, divê ew bixebite."

Jinikê xwest bi berdilka xwe ser çavê xwe bigre, lê dû re dev jê berda û dest bi girî kir:

"Mezin bike, bighîne û dû re bila weha bibe..."

Johnny bi nezaketeke bi keder bersiva dîya xwe da:

"Te min mezin nekir. Min xwe gîhand û mezin kir, yadê. Û min Will jî mezin kir. Ew ji min girtir, girantir û dirêjtir e. Ez bi zaroktî baş xwedî nebûm. Gava ku ew hate dinyayê û di dema wî ya zaroktîyê de, ez xebitîm û min heqê nên anî malê. Lê êdî qediya. Will divê ya weke min kar bike, ya jî here binê dojehê. Kîjanê hildibijêre, bila hilbijêre, êdî ne xema min e. Ez westiyam, êdî diçim. Ma tê ji min re nebêjî, rêya te vekirî be?"

Jinikê bersiv nedayê. Dîsa berdilka xwe avêtibû ser çavên xwe û digirîya. Johnny li binderî demekê sekinî. Îsk îska jinikê bû û digot:

"Heta ku hişê min û qûweta min digihaştê, çi ji destên min dihat, min kir. Ez bi vêya bawer im."

Johnny ji malê derket û di kolanê de, ber bi jêr meşiya. Gava ku ew dara bi tenê dît, rûyê wî bi kêf vebû. Bi dengekî zirav, di ber xwe de weha digot:

" Ez ji nuha û pê ve nema tu tiştî dikim."

Bi xwestineke xurt li ezman nihêrî, lê tîrêjên rojê yên ku dibiriqandin, çavên wî tarî kirin. Li ber wî rêyeke pirr dirêj hebû û wî qet nedilezand. Fabrîkeya lîfan derbas kir. Gava dengê girgita dezgehan hate guhê wî, bişirî. Ev bişirandineke şêrîn û dilovan bû. Ji kesî nefret nedikir; heta ji makîneyen ku gir gir û çîrke çîrk dikirin jî nefret nedikir. Di dilê wî de kîn- mîn tunebû, tiştek tunebû. Bi tenê daxwazeke xurt ya îstirahatê hebû. Her ku nêzîkî pesaran dibû, erdê fireh dihatin pêşiya wî, xanî û fabrîka êdî zêde nedihatin dîtin. dû re bajar bi temamî li pê wî ma. Da ser xaçerêyeke bi dar ya ku li kêleka rêya hesin û meşiya. Ev ne meşa mirovekî bû. Di eslê xwe de, nedişibiya mirovan. Karîkaturekî mirovan bû. Milên wî yên daketî, pişta wî ya xûz, bejna wî ya kinik, sînga wî ya teng... Ew bûbû perçeyekî jiyanê yê bênav ku wek maymûnekî nexweşî duqatî, xwe bi erdê re dikşand.

Îstasyoneke piçûk ya trênê derbas kir û xwe li bin darekê, li ser gîhayê dirêj kir. Hemû paşnîvroya xwe li wir derbas kir. Carinan xilmaş dibû. Carinan jî ji ber ku adaleyên wî dihatin hev, ji nişka ve ji xewê şiyar dibû. Gava şiyar dibû jî bêî ku tev bilive, wek qalibekî vediket; Ji cîhê xwe yê ku lê veketîbû, li çûkan temaşe dikir ya jî di nav gulîyên dara ku di set serê xwe re, li ezmana dinihêrî. Çend caran bi dengê hêl keniya. Lê tu alaqa vî kenî û tiştên ku didît ya jî dibihîstin, tunebû. Piştî ku roj çû ava û tarîya destpêka êvarî xwe bera erdê da, trêneke bata bi dengekî bilind hate îstasyonê. Johnny, gava ku lokomotîfê, vagonên trênê li dû xwe dikşand û meqes diguherî, xwe nêzîkî trênê kir. Derîyê vagoneke vala ya bara vekir, bi zehmetî hilkişiya û kete hundur. Derî gitt.

Lokomotîfê li tûtûkê xist. Johnny xwe li erdê dirêj kiribû û di tarîyê de dibişirî...

# YÊ MEKSÎKÎ

Tu kesî çîroka wî nizanîbû. Tew endamên Juntayê bi yekcarî nizanî bûn bê ew çi kes e. Ew "sirra wan î piçûk" û " welatperwerê wan î mezin" bû. Û ji bo şoreşa Meksîkayê ya ku nêzîk dibû, li gor hêza xwe, bi qasî wan bi xîretî xebitî bû. Heta ku ew bi vê yekê hesiyan, gelek wext derbas bûbû. Ji ber ku di nav Juntayê de, tu kesî jê hez nedikir. Wê roja ku ew kete hundurê lokala qelabalix û biteqûreq ya rêxistinê, hemûyan şika ku ew ji terefê ajanên Dîaz ve hatiye kirrîn, jê kiribûn. Gelek heval di girtîgehên sivîl û leşkerî yên Dewletên Yekbûyî de bûn û yên din jî ji bo ku li ber dîwarekî tûxla bên gulebaran kirin, bi destkelepçekirî derbasî aliyê dinî hudûd dikirin. Lêwik di çavpêketina cara yekem de, tu întîbayeke pozîtîv li ser wan nehiştibû. Ew xort bû û emrê wî, ji hîjdeh salan ne zêdetir bû. Li gor emrê xwe jî pirr girs xuya nedikir. Wî navê xwe wek Felîpe Rîvera dabû nas kirin û gotibû ku ew dixwaze ji bo şoreşê bixebite. Hemû ewqas bû; ne peyveke zêde û ne tu îzahatên din... Ew li ser piya bû û dipa. Ne di lêvên wî de tu bişirandin û ne jî di çavên wî de tu nerîneke dostane hebû. Paulîno Vera yê bertewîl jî dema ku li lêwik niherîbû, di hundurê xwe de ji nişka ve ricifandinek hîs kiribû. Li vê derê mexlûqek ku sawek dixist dilê mirov û nedihat fahm kirin hebû. Di çavên lêwikî reş de, nerînek wek nerîna marê bijahr hebû. Ev çav bi neyarîyeke kûr û konsantrekirî wek agirekî sar diçûrisandin. Wî çavên xwe ji ser bihevresûndxwaran dagerand û berê xwe da xanima Sethby ya ku daktîlo bikar tanî. Çavên wî sanîyeyekê li ser wê ma. Dema çavên wan li hev ketin, xanima Sethby dest û lingên xwe li hevdû geriyayî hîs kir. Bi jinikê re hîseke ecêb û xerîb ya ku bû sebeba qutkirina karê wê jî peyda bû. Jinikê ji bo

berdewamkirina nivîsandina nameya xwe, çend rêz ji nû ve xwendin. Paulino Vera bi çavên tijepirs li Arrelano û Ramos nihêrî. Wan jî bi eynî awayî hem li wî û hem jî li hevdû nihêrîn. Ji çavên wan şik û bêqerarbûna wan dihat xwendin. Di vî xortê tenik û zirav de, hemû talûkeyên ku ji nenasiyê dihatin, xuya dibûn. Ew, nenasî bi xwe bû. Ew, yekî ku ji terefê şoreşgerên durust yên ku ji Dîaz û zalimtiya Dîaz nefreteke bêhed û hudûd ( tenê nefreteke durust ya welathezan) dikirin ve nikarîbû bihata fahm kirin. Ew, tiştekî ku aqilê wan nedigîhaştê bû.

Vera yê ku ji hemûyan jîrtir û bileztir, bi dengekî sar got:

– Baş e. Tu dibêjî ku ez dixwazim ji bo şoreşê bixebitim. Çaketê xwe ji xwe bike û li wê derê daliqîne. Ka bi min re were, ezê cîhê paçik û satilê nîşanî te bidim. Erd gemarî ye. Tu dê berê vê derê paqij bike û dû re odeyên din. Gemar divê bê avêtin û paşê dora paqijkirina paceyan tê.

Lêwik pirsî:

– Ma ev ji bo xatirê şoreşê ye?

Vera bersiv da:

– Belê, ev ji bo xatirê şoreşê ye.

Rivera bi nerînên bişuphe li wan kesên ku li odeyê bûn nihêrî û dû re çakêtê xwe ji xwe kir û got:

– Weha be, baş e.

Û hemû ev bû. Êdî her roj dihat karê xwe; erd dimalt, firçe dikir û paqij dikir; ariya sobeyan vala dikir, êzing û komir tanî û berî ku yê wanî herî jêhatî bihata û li ber maseya xwe ya nivîsandinê rûnişta, sobe jî pêdixist.

Wî rojekê weha pirsîbû:

– Ma gelo destûr heye ku ez li vê derê razêm?

Ihi! Mesele ev bû, va tiliya Dîaz xuya bû. Razana li odeya Juntayê dihat maneya bidestxistina sirrên rêxistinê, lîsteyên nava û navnîşanên hevalên ku li Meksîkayê dimînin. Ev daxwaza wî nehat qebûl kirin û Rîvera careke din jî behsa vê meseleyê nekir. Wan pê nizanî-

bûn bê lawik li ku radiza û dixwar. Rojekê Arrellano çend dollar dirêjî wî kiribû. Lê wî serê xwe kil kiribû û pere qebûl nekiribû. Dema ku Vera mudaxele kir û ji bo qebûlkirina pereyan zor dabûyê, weha gotibû:

– Ez ji bo şoreşê dixebitim.

Ji bo destpêkirina şoreşekê pere lazim bû û Junta jî di vî warî de hertim di tengasiyê de bû. Endamên Junta birçî bûn û heta ku taqet di wan de hebû dixebitîn. Lê dîsa jî gelek caran, biserketin û nebiserketina şoreşê bi peydekirina çend dollaran ve girêdayî bû. Rojekê dema ku wan kirêya du mehan nedabûn û xwediyê xênî wan bi jixênîderxistinê tehdît kiribû, yê ku şêst dollarê zêrîn danîbû ser maseya May Sethby, lawikê paqijker Felîpe Rîvera yê ku kincên erzan û riziyayî lê bû. Li ser maseya May Sethby, sê sed nameyên bi daktîloya ku rawestandin lê tunebû, hatibû nivîsandin, (daxwazên alîkariyê; daxwaza selahiyeta ji grûpên karkeran yên organîzekirî; ji bo di beşa nûçeyan de muameleyeke adîl, daxwaziyên ji redaksiyonên rojnameyan; Protestoyên li dijî wê mûameleya zalim ya ku dadgehên Dewletên Yekbûyî bi şoreşgeran re dike) nepostekirî li bende pûlan sekinîbûn. Saeta Verayî zêrî kevn ku ji bavê wî mabû, hatibû firotin. Hungulîska zêrî bêdesen ya May Sethby jî bi wî awayî çûbû. Rewş bê hêvî xuya dikir. Ramos û Arrelano simbêlên xwe yên dirêj ji bêçaretiyê ba didan. Name diviyabû bihata şandin û daîreya posteyê jî pûl bi deyn nedidan. Wê gavê Rîvera şepqeyê xwe da serê xwe û derket derve. Dema ku ew vegeriya hezar pûlên dusentî danî ser maseya May Sethby.

Vera ji hevalên xwe re got:

– Ez meraq dikim, gelo ev ne zêrên Dîaz yên lanetlêhatî bin?

Eniyên xwe qermiçandin û fikirîn, lê nizanîbûn bê ewê li çi bifikiryana. Û bi vî awayî Felîpe Rîvera, ew lawikê ku ji bo şoreşê erd paqij dikir, dema lazim dibû, ji bo şoreşê dana pereyên zêr û zîvî her berdewam kir. Hîn jî dilên wan lê venebûbû. Wan ew nas nedikirin. Rêyên wan ne yek bû. Wî tu bawerî nedabû. Firsera pirski-

rinê nedida tu kesî. Ew pirr xort bû, lê dîsa jî tu kesî newêrîbû jê bipirsiya.

Arrelano bi awayeke bêçare got:

– Kî çi dizane, ew belkî kesekî pirr bi esil û rûhekî bi tena serê xwe be. Ez nizanim, nizanim.

Ramos:

– Ew ne wek mirovên din e.

May Sethby:

– Ruhê wî pirr zuha ye. Ji bo wî tu ta'ma jiyanê nemaye. Ew wek termekî ye, lê dîsa jî bi qasî ku mirov lê ecêbmayî bimîne, li ser xwe ye.

Vera:

– Ew ji dojehê derketiye. Kesên ku li dojehê nemabin, nikarin weha bin û tew hîn zarok e.

Lê tev vê jî tu kesî nikarîbû jê hez bikira. Ew tu carî ne dipeyivî, nedipirsî û tu pêşniyar–mêşniyar jî nedikir. Ew bi rûyê xwe yê ku tu mane tê de xuya nedibû, li wir disekinî û guhdarî dikir. Dema ku ew di derheqa şoreşê bi dengekî bilind û bi heraret dipeyivîn, Rîvera jî ji bilî çavên xwê yên ku agirekî sar jê diçû, mîna miriyekî xuya dikir. Çavên wî yên tûj wek metqebek ji qeşayê, mirov diheyirand û dixist nava endîşeyê, ji rûyekî diçû ser rûyekî din û ji gotarvanekî diçû ser gotarvanekî din. Vera bi bawerî ji May Sethby re got:

– Ew ne ajan e. Ew welathezek e. Tu şupheya min ji vêya tuneye. Tiştê ku ez dibêjim, bila bê bîra te; ew ji me hemûyan bêtir welathez e. Ez vê dizanim, di dilê xwe û di mejiyê xwe de hîs dikim. Lê ez wî qet nas nakim.

May Sethby:

– Mîzaceke wî ya pirr ters heye.

Vera ricifî û got:

– Ez dizanim. Wî bi wan çavan li min nihêrî... Ew çav, ne çavên hezkirinê ne, mirov tehdît dikin, wek pilingekî dirinde dinihêrin.

Ez dizanim ku ez bi vê daweyê re îxanetê bikim, ew dê bêşik min bikuje. Dilê wî tuneye. Ew wek pola bêmerhamet û hişk û wek seqemê sert û sar e. Ew wek tava heyva şeveke sar ya zivistanî ku mirov li serê çiyayekî xalî ji sermayê diqefile, ye. Ez ne ji Dîaz û ne jî ji hemû qatilên wan ditirsim. Lê ev lawik, ez ji vî lawikî ditirsim. Ne henek e, ez bi rastî jê ditirsim. Ew wek nefesa mirinê ye.

Di gel vê jî yê ku ji bo ceribandina bawerî û dilsoziya Rîvera ya di kar de, yên din îkna kir, Vera bû. Wê demê xeta komunîkasyonê ya di nav Los Angelesê û Kalîforniyaya Jêrîn de hebû, hatibû qut kirin. Sê hevrayên wan di kozikên ku wan bi xwe kola bûn de, hatibûn gulebaran kirin û kozikên wan bûbûn mezelên wan. Du hevrayên wan jî li Los Angelesê, girtîyên Dewletên Yekbûyî bûn. Şêfê Federasyonê, Juan Alvarado yê ku şoreşger bi xwînê der dikirin, wek wehşekî bû. Hemû planên wan eşkere kiribû. Wan li Kalîforniyaya Jêrîn nema dikaribûn , bi şoreşgerên aktîv û bi dilxwazên xwe yên ku nuh ketibûn nav rêxistinê re têkiliyan deynin. Ev wezîfe dan Rîverayê xort û ew ber bi başûr ve şandin. Gava ew vegeriya, xet hatibû çêkirin û Juan Alvarado hatibû kuştin. Ew di nav nivînê xwe de, bi kêreke ku heta ber destiyê wê di sînga wî de çikyayî hatibû dîtin. Vêya ji dervayî wezîfeya Rîvera bû, lê endamên Juntayê dizanîbûn bê di demên weha de, ew çawa bi lez bû. Wan tu tişt ji wî ne pirsîn û wî jî ji wan re tu tişt ne got. Lê wan li hevdû nihêrîn û ev ji çavên wî xwendin.

Vera:

– Min ji we re gotibû. Dîaz divê ji zilamekî kal bêtir, ji vî xortî bitirse. Ew bê aman e. Ew destê xwedê ye. Ew şexsiyeta ku mirov ji ber nikarîbû tehamul bikira ya ku May Sethby behsa wê dikir û ji çavên tu kesî nereviyabû, bi vî awayî derketibû ortê. Rîvera carna lêvçiryayî, hinarikên rûyê wî şînbûyî an jî bi guhekî werimî dihat. Ev pirr eşkere bû ku ev birîn, encamê pevçûna wî ya li wê devera ku lê radiza û dixwar, pere qezenc dikir û li wê dinyaya gelek karên ku endamên rêxistinê pênizanîbûn dikir, bûn. Piştî demekê, Rîvera

di rojnameya şoreşger ya ku ji hefteyê carekê derdiket de, dest bi karê tîpografiyê kir. Carinan weha dibû ku wî nikarîbû tîp rêz bikirana. Tiliyên wî yên girdikê û destên wî ewqas eciqî û êşiyayî bûn ku wî nikarîbû wan tev bilivanda. Milekî wî bi kêleka wî ve daliqiyayî bû û rûyê wî jî ji ber êşeke ku nayê gotin deforme bûbû.

Arrellano got:

– Tu ji min bipirse; ev serseriyekî dera hanê ye.

Ramos:

– Ew diçe deverên xerab.

Vera pirsî:

– Baş e, lê gelo ew pera ji ku peyde dike? Li min binihêrin, li gor ku min nuh bihîst; wî hîn îro ji bo heqê kaxizên rojnameyê sed û çil dollar daye.

May Sethby:

– Û dû re awayê wî yê wendabûnê. Ew tu carî behsa ku bi ku de diçe, nake.

Ramos pêşniyarek avêt ortê:

– Em divê yekî bi dû wî de bişînin.

Vera:

– Ez tu carî naxwazim, di şûna wî kesê ku dê wî taqîb bike de bim. Ez ditirsim ku ji dervayî dema ku hûn min têxin mezel, hûn dê tu carê din nikaribin rûyê min bibînin. Mirov xofê ji vî lawikî digre. Ew dê tu carî destûra ku xwedê di nava wî û hedefa xezeba wî keve, nede.

Ramos li xwe mikur hat û got:

– Ez çi derewa bikim, ez xwe li hember wî wek zarokekî dibînim.

Arrellano:

– Ez ji we re tiştekî bibêjim; ji bo min, ew îrade û quwet bi xwe ye. Ew dehbeyek e; gurê dirinde ye; marê mirdarok e; tûpişkê ku bi mirov vedide ye.

Vera:

– Ew di şexs de muşaxesbûna şoreşê ye. Rûh û agirê şoreşê ye. Ew

daxwazeke heyfa bêpîvan ya ku bi bêdengî lê dixe ye. Ew milyaketê wêrankirinê yê ku di bêdengiya şevê de difire ye.

May Sethby bi dilovaniyeke mezin got:

– Dilê min bi wî dişewite. Kes tu nêzîkbûnê nîşanî wî nade. Ew ji herkesî nefret dike. Ew me tercîh dike, ji ber ku em û ew ji bo eynî armancê dixebitin. Ew bi tena serê xwe ye... tikî tenê.

May Sethby kelogirî bû, dengê wê hate birîn û hêsir ketin çavên wê. Awayê jiyana Rîvera û wextên wî yên çûyin û hatinê, bi temamî nihênî bûn. Carinan hefteyek derbas dibû jî wan rûyê wî nedidîtin. Carekê ew meheke xuya nebûbû. Lê gava ku ew vedigeriya, bêî ku tu peyv ji devê wî derketa, pereyên zêr datanî ser maseya May Sethby. Carinan jî bi rojan, bi hefteyan li ba Juntayê dima. Lê di wan deman de jî di saetên cîhê de diçû derve. Ji serê sibehê heta derengê şevê, li ortê xuya nedibû. Şevekê Arrellando wî bi destên werimî û bi lêva çiriyayî ya ku hîn jî xwîn jê dihat, dîtibû. Ew wê gavê li çapxaneyê dixebitî. Dem hatibû. Qedera şoreşê bi Juntayê ve hatibû girêdan. Lê Junta bi xwe di rewşeke zor de bû. Ihtiyaca wan ya ji pereyan ji her wextê bêtir bû. Lê peydekirina pereyan jî ji her wextê zortir bû. Welathezan senta xwe ya talî jî dabûn û êdî tu tiştê ku wan bikariba bidana, nemabû. Grûpên karkerên çandiniyê-karkerên rojê yên ku ji Meksîkayê hatibûn– nêviyê wê piçika heqê xwe yê rojane didan şoreşê. Lê vêya têr nedikir û ihtiyacî bi pereyên zêdetir hebû. Ew xebata dijwar ku bi salan dihate meşandin, tu nema bû ku ber bida. Dem stewyayî bû. Şoreş li ser tayekî pora mabû. Dehfdaneke talî ber bi pêş de, hewildaneke bi mêrxasî... û dû re mîlê nîşanderê dê serkevtin nîşan bida. Wan Meksîkaya xwe baş nas dikirin. Piştî ku şoreş dest pê bikira, êdî dê bi xwe belav biba. Hemû sîstema Dîaz dê wek qesra ji kaxizan bi erdê re bûbûya yek. Herêmên nêzîkî hudûd ji bo serîhildanê amade bûn. Yankiyek bi sed zilamên bi riza xwe, ji bo derbasî aliyê din yê hudûd bibin û Kalîforniyaya Jêrîn îstila bikin amade bûn. Lê pêwîstiya wî bi tivingan hebû. Têkiliyê Junta li her derê welêt, hera bi Atlantîkê bi gelek

mirovan re hebû û pêwîstiya hemûyan bi sîlehan hebû. Macerapeperest, lyckoriddare haydût, karkerên Amerîkayê, sosyalîst, anarşîst, şerkir, penaberên Meksîkî, karkerên çandiniyê yên ku ji ber esaretê reviyabûn, karkerên madenê yên ku li Coeur d'Alene û Colorado di îşkencexaneyan re derbas bûbûn û bi daxwaza heyfê dikelin... Bi kurtî hemû kesên ji binê civakê û hemû elemanên tevlihev yên dinya hevçax li bende sileh û cepxaneyan bûn û hemûyan bang dikirin: Tiving û cepxane, cepxane û tiving! Ger ev koma mirovên ku bi hîsên heyfstendinê dikelin û difûrin, hudûd derbas bikin, tê wê maneya ku şoreşê dest pê kiriye. Berê deriyên bakur yên hudûd û avahiya gumrukê têketa destên wan. Dîaz nikarîbû li hember vêya rawestiya. Dîaz dê cesaret nekira û ordiyên xwe neşanda ser wan. Ji ber ku wê mecbûrî paraztina hêla başûr bûba. Lê tev hemû tiştî, agirê şoreşê dê ji başûr belav biba. Gel dê serî hilda. Dê bajar bi dû bajar, sîlehên xwe danîna û hemû eyalet dê yek bi yek biketana û ala teslîmiyetê rakirana. Û di talîyê de, ordiyên qehreman yên şoreşê dê ji herçar aliyan êrîşî keleha Dîazî herî talî, bajarê Meksîko bikirana. Lê kar bi pereyan diqediya. Mirovên wanî ji dil û bi hewes yên ku tiving bikar bianîna hebûn. Wan tucarên ku dê sîleh bifrota û teslîmî wan bikira jî nas dikirin. Lê xebata amadekirina şoreşê hemû îmkanên Juntayê daqurtandibû. Dollarê herî talî hatibû xerc kirin, îmkana herî talî hatibû bikar anîn û welathezê herî talî yê birçî jî zuha bûbû. Lê şoreş li ber devê derî bû. Sîlah û cepxane! Ordiyên gel diviyabû çekdar bûba. Lê çawa? Erdên Ramos yên ku dest danîbûn ser, dihate bîra wî. Arrellano ji ziyankeriya ku di xortaniya xwe de kiribû, sixêf dikirin. May Sethby bi pirsa ku ger Junta hebekî destê xwe bigirta, gelo dê rewş ne guhertî ba, meşgûl bû. Paulîno Vera: bifikirin, azadiya Meksîkayê bi çend dollarên pîsik ve girêdayî ye. bifikirin! Bêçaretîyekê xwe bera ser rûyê hemûyan dabû. Hêviya wanî talî yê ku karîbûn berê xwe bidanayê, Jose Amarillo yê ku soza pereyan dabû wan jî li Chihuahuayê, li mala xwe hatibû girtin û li ber dîwarê êxur gulebaran bûbû. Wê gavê Rîverayê ku milên xwe

yên vemaltî di ava qirêjî de dakiribû û erd paqij dikir, firçe sekinand, serê xwe rakir û pirsî:

– Ma pênc hezar têr dike?

Hemûyan bi şaşmayî li hevdû nihêrîn. Vera xweziya xwe daqurtand û di maneya "erê" de, serê xwe hejand. Ew nema karîbû bipeyiviya. Lê hîseke baweriyeke xurt ketibû hundurê wî. Rîvera:

– Wê gavê sîparîşa sîlehan bidin.

Dû re axaftina xwe ya herî dirêj ya ku heta wê rojê tu carî nehatibû kirin, kir:

– Wext pirr teng e. Di hundurê sê hefteyan de, ez dê pênc hezaran ji we re bînim. Heta wê gavê hewa jî hêdî hêdî germ dibe. Ji xwe ez nikarim hîn zûtir peyde bikim.

Vera bi hîsa baweriya xwe ya ku ji ber vê yekê çêbûbû re şer dikir. Mirov nikare bawer bike! Ji wê roja ku kete nav şoreşê û heta nuha, gelek hêviyên giranbiha wenda bûbûn. Wî baweriya xwe bi vî lawikê paqijkerê şoreşê tanî, lê ev mesele nediket serê wî û ji ber vê jî newêrîbû bi rastî bawer bike:

– Tu dîn e!

Rîvera:

– Piştî sê hefteyan. Sîparîşa tivingan bidin.

Rabû ser xwe milên xwe yên vemaltî rast kir û çakêtê xwe li xwe kir û got:

– Hûn sîparîşê bidin. Ez nuha diçim. Piştî bazdana bi vir de û wê de, pevçûn, liberhevdan û xeberdanên bi telefonan, bi şev li buroya Kelly civîneke hat çêkirin. Karê Kelly pirr bû. Wextê wî yê ku serê xwe bixuranda jî tunebû. Ew xemgîn bû, kêfa wî ne lê bû. Wî ji bo maçeke boksê bi Bill Carthey re, Danny Ward ji New Yorkê anîbû. Ji roja maçê re sê hefte tenê mabûn. Lê karê wî rast nemeşiyabû û Billy Carthey birîndar bûbû. Birîna wî giran bû. Ev du rojên wî ne ku ew di nav nivîna de ye û xwe ji hemû nûçegîhanên sporê veşartibû. Tu kesê ku têketa cîhê wî tunebû. Kelly bêî rawestîn, telegraf da hemû kesên ku di sîkleta sivik de hatin bîra wî, lê

yek ji wan jî ne vala bû û bi kontraktên xwe ve girêdayî bûn. Hêvî nuha ji nû ve diçûrisî. Tam nediket serê wî, lê qels bûya jî hêviyek xuya dibû. Dema ku hatin hember hev, Kelly li Rîvera nihêrî û paşê got:

– Ez bala xwe didimê ku tu pirr cesûr î.

Çavên Rîvera ji nefreteke bi jahr dibiriqandin, lê tu guhartin tê de çênebû û tenê weha got:

– Ez dikarim zora Ward bibim.

– Tu vê çawa dizanî? Te ew di dema maçê de tu carî dîtiye?

Rîvera serê xwe di maneya na de kil kir.

Kelly got:

– Ew dikare çavgirtî û bi destekî zora te bibe.

Rîvera milên xwe hejandin. Kelly bi awakî sert jê pirsî:

– Ma hemû tiştên ku tu ê bibêjî, ev in?

Rîvera:

– Ez dikarim zora wî bibim.

Li ser vê Michael Kelly got:

– Ez meraq dikim, gelo tu dikarî zora tu kesî bibî?

Michael birayê tertîpkarê maçên boksê bû û buroya bişertlîstinê ya ku navê wê "Yellowstone" bû, birêve dibir. Wî li wê derê, ji bişertlîstina li ser boksê gelek pere qezenc kiribû. Rîvera ji dêlba bersivê, bi awireke sert û tijenefret li wî nihêrî. Sekreterê tertîpkar mirovekî xort û tîpekî sportmen bû. Ew bi qerf keniya. Kelly bi axaftina xwe, ew hewa nedostane belav kir:

– Ka bisekine, tu Roberts nas dikî. Min şand pê wî, ew divê nuha li vir bûya. Rûne û li bende be. Tu ji min bipirsî; tu şensa te ya biserketinê tuneye. Ez nikarim bi maçeke basît, henekê xwe bi temaşevanan bikim. Weke ku hûn jî dizanin, cîhên herî nêzîkî rîngê, bi panzdeh dollara ye.

Dema Roberts hat, serxweş bû. Ew yekî zirav, dirêj û zeîf bû. Axaftina wî jî wek meşa wî ya sist û bêruh bû.

Kelly raste-rast ket nav meseleyê:

– Guhdarî bike Roberts; tu dipesinî û dibêjî ku min ev zarokê Meksîkî derxistiye ortê. Wek tu dizanî, Carthey milê xwe şikenandiye. Îro jî ev lawikê hanê rabûye, hatiye vira û bê fedî dibêje ku ew dixwaze têkeve şûna Carthey. Tu ji bo vê çi dibêjî?

Roberts serê xwe hêdî hêdî kil kir û got:

– Ev baş e, Kelly. Ew dikare baş boksê bike.

Kelly bi awayekî hêrsbûyî ji nişka ve got:

– Û dû re belkî tu dê bibêjî ku ew ê zora Ward bibe.

Roberts hebekî fikirî:

– Na , ez vê nabêjim. Ward rêviyekî rîngê ye û ew li kê bide, wan li erdê rast dike. Lê ew nikare weha bi hêsanî zora Rîvera bibe. Ez Rîvera nas dikim. Ew ne pariyekî hêsan e. Min tu carî nedîtiye ku ew tirsiya ye. Û hutuka wî ya çepê bi qasî ya rastê sert e. Ew di kîjan pozisyonê de be bila biba, dîsa jî dikare derbên pirr xurt biavêje.

Kelly:

– Ev tiştekî din e, vana bihêle. Ma gelo ew dikare bala temaşevanan bikşîne? Te di hemû jiyana xwe de, boksvanên bêhejmar gîhandiye. Ya rastî, ez serê xwe li ber tiştê ku tu dê bibêjî, ditewînim. Ma ev li hember pereyên temaşevanan, hêja ye, ne hêja ye?

Roberts:

– Belê ew dikare, çawa nikare! Bila tu şika te jê tunebe ku ew dê baş zorê bide Ward. Tu vî lawikî nasnakî, lê êz nas dikim. Min ew keşif kiriye. Tu pirîskeke tirsê jî pê re tuneye. Ew şeytanek e. Ger tu dixwazî pê bihesî, ew hosteyekî temam e. Ew dê wisa li Ward bixe ku devên we dê vekirî bimîne û ji ber hebûna qabiliyeteke weha ya li vî bajarî, hûnê giş şaş bimînin. Ez naxwazim, bibêjim ku ew dê zora Ward bibe. Lê ew ê maçeke weha bilîze ku hûnê bi rastî fahm bikin ku ew stêrkek ber bi bilindbûne ve diçe ye.

Kelly berê xwe da sekreterê xwe û got:

– Temam, baş e. Telefonê Ward re veke. Min jê re gotibû, ez yekî ku îdare bibe peyde bikim, ez dê bişînim pê te. Nuha ew li Yel-

lowstoneyê fiyaqê dike.

Kelly dû re vegeriya ser meşqker:

– Tu dê tiştekî vexwe?

Roberts dema highballa xwe(wîskiya bi soda)ta'm kir û daqurtand, dest bi axaftine kir:

– Min tu carî ji we re negotiye ku bê min ev lawik çawa keşif kiriye. Ew çend sal berê hatibû salona meşqkirinê. Min Prayne ji bo maça ku wê bi Delaney re bikira, dixebitand. Prayne dîn e. Tu merhamet pê re nîne. Ew li hember hevalên xwe yên antremanê bê însaf bû; mirov bihişta, wî dê wan perçe bikitana. Ji ber vê, min tu kesê ku bixwazta bi wî re bixebitiya, nikarîbû peyde bikira. Min lê nihêrî ku ev lawikê Meksîkî yê birçî li wê derê sekinî ye. Ez jî di rewşeke pirr xerab de bûm. Min ew girt, lepik xistin destên wî û wî ajot rîngê. Ew wek çerm saxlem bû, lê zeîf bû. Wî di derheqa bingehên destpêkê yên boksê de, tu tişt nizanîbû. Prayne ew perîşan kir. Wî du raundê ecêb, îdare kirin. Dû re, dilê wî ji bîr çû. Lê dilê wî ji birçûbûna, ji bîr çûbû. Ma lêxistin xwaribû? Off, lêxistineke weha xwaribû ku nedihat naskirin. Min nîv dollar da wî û zikê wî jî tam tije kir. Dema ku xwarin dixwar, divê we bidîta bê çawa çelp çelpa devê wî bû. Ev çend roj bûn ku tu tişt di qirika wî re neçûbû xwarê. Min digot, êdî ew dê nema li van derana xuya bibe. Lê roja pê wê re, ew tev devûrûyê xwe yê perîşanbûyî dîsa hat. Ew bi nîv dollarî û xwarinê ve qayil bû. Ew her ku diçû baştir dibû. Ew tiştekî ecêb zexm e û ji dîya xwe boksor ketiye. Tu hîsên wî tunene, wek perçeyekî qeşayê ye. Ji dema ku min wî naskiriye û heta nuha, wî tu carî deh gotin li dû hevdû negotine. Ew tiştê ku divê bê kirin, dike û hem jî pirr baş dike.

Sekreter got:

– Min wî li ba we dîtibû. Ew li ba we pirr xebitî.

Roberts bersiv da:

– Ew bi hemû elemanên minî herî qenc re xebitî. Û ew gelek tişt ji wan fêr bû. Wî dikarîbû zora hinekan ji wan bibira. Lê wî tu carî

ji dilê xwe û bi riza xwe, ev kar nedikir. Wî ji boksê qet hez nedikir. Lê weke ku hez dikir, dida xuya kirin.

Kelly got:

– Ger ez ne şaş bim, wî di van mehên dawî de, li klûbên piçûk boks dikir.

Roberts:

– Belê. Lê ez nizanim, bê çi bi wî hatiye. Damarê wî yê boksortiyê rabûye, çi ye. Ew wek firtineyekê derdiket ortê û hemû boksorên mezin yên mehellî, li erdê rast dikirin. Weha xuya bû ku wî dixwast pera qezenc bike û tev ku ev ji kincên wî diyar nabe jî wî gelek pere dan hev. Mirovekî ecêb e. Kes nizane, bê ew çi karî dike. Kes nizane, bê ew wextê xwe çawa û li kî derê derbas dike. Gava ku ew di beşa sporê de jî dixebite, her roj piştî qedandina kat wenda dibe. Ew carinan çend hefteyan li ser hev xuya nabe. Lê ew guh nade nesîhetan. Ew zilamê ku menacertiya wî bike, dê serweteke mezin bidest bixe. Lê ew qet li vê nafikire jî. Û divê hûn dilxwaziya wî ya di warê pereyên pirr de, bibîne, wê gavê mirov dikare şertê xwe yê peymanê pê bide qebûl kirin.

Di wê esnayê de Danny Ward ket hundur. Wek sahneyeke tiyatroyê bû. Menacer û meşqkerê wî jî pê re bûn. Danny bi nezaket û dostane, wek bayekî ket hundur. Silav li yên dora xwe kir; henekek bi vîya kir, henekek bi wîya kir; li vir nihêrî, li wir nihêrî; bi her kesî re, yek bi yek bişirî. Adeta wî weha bû, di van tevgerên wî de, tenê heta dereceyekê samîmiyet hebû. Ew aktorekî baş bû û pê dizanibû ku ji bo mirov bikaribe li vê dinyayê bigihîje derekê, nezaket û xwe şinnekkirina bi her awayî, şert e. Lê ew di hundurê xwe de, boksorekî bihesab, xwînsar û tucar bû. Tiştên din, maske bûn. Yên ku wî nas dikirin, an yên ku pê re didan û distendin dizanîbûn ku ew bi tenê li menfaera xwe difikire. Ew di hemû bazariyan de hazir dibû û li gor hinekan jî menajerê wî ji navberkekî pê ve ne tu tiştek bû; wî menajerê xwe li ser tilîka xwe dida lîstin. Lê rewşa Rîvera bi temamî guhertî bû. Di damarên wî de, hem xwîna çermsora(indîan)

û hem jî ya spanyola digeriya. Ew bê deng û bê livandin, li quncikekê xwe dabû erdê. Lê çavên wî yên reş li ser wan yek bi yek digeriyan û bi awayê ku dixwaze bê çi di hundurê wan de heye bixwîne, bala xwe dida hemû tiştan.

Danny got:

– Ne xwe, hezret ev e, ha?

Danny raqîbê xwe, bi çavan pîva û dû re dewam kir:

– Çi heye, çi tuneye, kurikê piçûk?

Çavên Rîvera bû wek du bizotên êgir, lê tu bersiv nedayê. Wî ji hemû biyaniyan, ji hemû Angloamerîkanan nefret dikir. Lê gava çavên wî bi vî zilamî ket, di hundurê xwe de, ji nişka ve nefretek ku her diçû bilind dibû, hîs kir.

Danny bi awakî bi qerf got:

– Hey xwedêyo! Ez hêvî dikim, tê nexwaze ku ez bi yekî kerr û lal re maçê bikim?

Dema pixkînî sekinî, wî dîsa dest pê kir:

– Qey Los Angeles xera bûye ku we çû vîya peyde kir. Gelo we ew ji kîjan zarokxaneyê aniye?

Roberts Rîvera parazt û got:

– Danny, ji vê bawer be ku ev lawikekî pirr jîr e. Tu weha li nermikbûna wî nenihêre, ew qet ne nerm e.

Kelly li ber geriya û got:

– Ez heyrana çevên te bim Danny, nêviyê bilêtan hatine firotin. Em çawa bikin, me yekî jê baştir nedît. Tu divê qîma xwe pê bînî, ev ji tunebûnê çêtir e.

Danny dîsa li Rîvera nihêrî, keserek kişand û got:

– Divê ez lê miqate bim da ku bi derba yekem re, li erdê rast nebe.

Robert bi kerb, kir ufe-uf. Menajerê Danny bala wî kişand:

– Tu divê çavên xwe baş veke. Gava mirov bi yekî re cara yekem derdikeve maçê, bi şensa xwe ya baş bawerbûn, têrê nakê. Tê lê binihêre, tevli hertiştî jî belkî ew bikaribe hutukeke bi îsabet bavêje.

Danny bişirî û got:

– Meraqa nekin, ezê çavên xwe baş vekim. Ezê bi destpêkê re, hakimiyetê bistînim û dû re ezê ji bo kêfa temaşevanan, bi wî bilîzim. Ma panzdeh raund bes in, Kelly? Û dû re naqawt(knockout)?

– Ger tu weha bikî ku bişibe rastiyê, bes e.

– Û nuha emê bên ser bazarê.

Danny bê deng hesab kir.

– Bê şik, wek hesabê me û Carthey; ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî. Lê divê parvekirin guhertî be. Ez bi ji sedî heyştêyî qayil im.

Dû re vegeriya ser menajerê xwe û got: – temam? Menajer serê xwe, di maneya erê de kil kir. Kelly ji Rîvera pirsî:

– Ma te fahm kir?

Rîvera serê xwe kil kir. Kelly dest bi îzahatê kir:

– Mesele weha ye; para boksoran ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî ye. Tu yekî ne naskirî ye û ne hatiye ceribandin. Tu û Danny divê vêya li hevdû parve bikin; para te, ji sedî bîst û ya Danny jî ji sedî heyştê ye. Ev parvekirineke li gor heqiyê ye, ne werê Roberts?

Roberts tesdîq kir û got:

– Ev bi temamî dutust e, Rîvera. Ev ji ber ku hîn kes te nas nake, weha ye.

Rîvera:

– Ji sedî şêst û pêncê hatina ne safî, çi qas dike?

Danny:

– Belkî pênc hezar, belkî heyşt hezar, tiştekî li wê dorê. Para te jî nêzîkî hezar-hezar û şeş sedî dike. Ev ji bo lêdaneke baş ji boksorekî mîna min, pereyekî ne xerab e. Ma ne weha ye?

Rîvera bersiveke weha da ku herkes lal mabû:

– Kî zora kê bibe, bila hemû pere yên wî bin.

Civat ket nav bêdengiyeke kûr.

Menajerê Danny:

– Ev, wek mirov şekirê zarokekî piçûk jê bistîne ye.

Danny aciz bû û serê xwe kil kir:

– Ev demeke dirêj e ku ez di nav vî karî de mim. Ez tu siyê ne dixim ser hakemê rîngê û ne ser van kesên hazir. Ez dê behsa maçên lihevkirî û hinek dek û dolabên carinan tên kirin, nekim. Lê tiştê ku ez dibêjim, ev e; derketina maçeke weha ne li gor min e. Ez ji serkevtina xwe baş bawer im; mesele ne ev e. Lê bifikire ku destê min şikest, ma ne weha? An jî yekî dilnexwaz dikare min bixapîne û tiştekî ku laşê min sist bike bi min bide vexwarin.

Danny serê xwe bi awayekî jixwebawer kil kir û pirsî:

– Ez qezenc bikim jî wenda bikim jî para min ji sedî heyştê ye. Tu ji vê re çi dibêjî, Meksîkiyo?

Rîvera serê xwe, di maneya "na" de kil kir. Danny wextî biteqiya. Li vê derê, êdî blof derbas dibû.

Danny got:

– Way Meksîkîyê ser reş û ehmaq! Ez dikarim ji nuha de dev û bêvila te tije xwîn bikim!

Roberts kete orta wan. Tu guhertin di rûyê Rîvera de çênebû, înada xwe domand û gotina xweya berê tekrar kir:

– Kî bi serkeve, bila hemû hatin ji wî re be.

Danny pirsî:

–Tu vêya ji bo çi dixwazî?

Bersiva Danny weha hat dayin:

– Ji ber ku ez dikarim zora te bibim.

Danny bi hêrs dikira çakêtê xwe ji xwe bikira. Lê menajerê wî dizanîbû ku ew vêya ji bo çavtirsandinê dike. Çaket li ser Danny ma û Danny bi ya wan kesên ku li ber wî digeriyan kir. Hemûyan aliyê Danny digirtin. Rîvera bi tena serê xwe bû.

Kelly:

– Li min guhdar bike, dîno. Tu bi çi çavî li xwe dinihêrî, tu ne tiştek e! Temam, me fahm kir ku ev çend meh in ku tu zora boksorên deverî dibe. Lê Danny boksorekî ji sinifa yekem e. Ew piştî vê maçê, dê ji bo şampiyontiyê bilîze. Û kes te nas nake. Ji dervayî Los Angelesê, tu kesî nebihîstiye ku behsa te hatiye kirin.

Rîvera milên xwe hejand û got:

– Piştî vê maçê, dê kesê ku min nas neke, nemîne.

Danny bang kir:

– Ma gelo tu dikarî ji bo saniyeyekê bi tenê jî xwe îkna bike ku tu dê karibe zora min bibî?

Rîvera di maneya "erê" de, serê xwe kil kir.

Kelly li ber wî geriya û got:

– Ka were hişê xwe bide serê xwe û li min guhdar bikî. Serê xwe hebekî bişuxulîne, ev maç dê ji bo te bibe reklameke pirr mezin. Rîvera qut birî: – Ez pereyan dixwazim, tu tiştekî din naxwazim.

Danny bi şêweyeke ji xwe ewle got:

– Tu çend tenûr nan bixwî jî, tu dê nikaribe zora min bibî.

Rîvera pirsî:

– Ger weha be, tu ji bo çi îtîraz dikî? Ger tu ewle be ku tu dê zora min bibî û pereyan di çenteyê xwe xe, tu ji bo çi zehmetiyê derdixî?

Danny:

– Baş e kero! Tu dê henekê xwe bi min bikî ha! Ez dê di rîngê de te perçe bikim. Kontraktê amade bike, Kelly. Yê ku bi serkeve dê hemû pereyan bistîne. Vê xeberê bighînin rojnameyên sporê; bêjin ku ev dê maçeke mirin û mayinê be. Bila ev kur bizanibe bê dinya çawa ye.

Dema sekreterê Kelly tam dest bi amadekirina kontraktê kir, Danny ew sekinand û berê xwe da Rîvera û pirsî:

– Ya wezinandin?

– Beriya ku em derkevin rîngê.

–Na na dosto, madem yê ku bi serkeve dê hemû pereyan bistîne, bila wezinandin jî sibehê saet di dehan de bibe.

Rîvera pirsî:

– Yê bi serkeve hemû pereyan distîne?

Danny di maneya erê de serê xwe kil kir. Ev mesele jî temam bûbû. Ew dê tam di dema ku herî xurt ba, derketa rîngê.

Rîvera got:

– Wezinandin di saet dehan de. Sekreter nivîsandina xwe domand.

Roberts ji Rîvera re, bi gazinî got:

– Ev tê maneya du kîlo û nîv zêdebûnê. Te gelek tawîz dan. Te maç ji destpêkê de wenda kir. Danny dê bi qasî ciwangayekî xurt be. Tu dîn e. Ew dê ji sedî sed zora te bibe. Tu şanseke te ya piçûk jî tuneye.

Bersiva Rîvera nerîneke tije nefret bû. Wî nefret dikir. Wî dizanîbû ku vîyê biyanî, di nav wan de yê herî durust e. Lê tev vê jî Rîvera ji wî jî nefret dikir.

* * *

Derketina Rîverayî rîngê hema hema qet tu bal nekişandibû. Bi tenê çend çepikên pirr qels silav li wî kiribûn. Çavên temaşevanan ji wî ne dibirîn. Wan bi çavên ku ew dê wek zarokekî di nav pencên Dannyê mezin de, bê serjêkirin didît. Ji xwe temaşevan xeyalşikestî bûbûn. Wan hêviya şerekî dijwar yê ku dê di navbera Danny Ward û Billy Carthey bûbûya dikirin. Lê nuha divê ji mecbûrî, qîma xwe bi vî lawikê rebenî nuhdestpêkirî binin. Nîşanên hisên ji ber vê guhertinê, di mesela bi şertlîstinê de eşkere dibû; li ser Danny, li hember yekê, bi duduyan heta bi sisiyan şert digirtin. Ji ber ku temaşevanê ku bi şert dilîze, pereyên xwe li ser wî kesê ku dilê wî jê re dixwaze û bawer dike ku ew dê bi serkeve, radizîne. Yê Meksîkî li quncikê rûniştîbû û dipa. Zeman derbas nedibû. Danny wî li wê derê disekinand. Ev lîstikeke kevn bû. Lê li ser boksorên nuh, hertim tesîreke mezin dikir. Dema ku ew weha di quncikê de, bi taswasa xwe û bi temaşevanan re tenê diman, tirsek diket dilê wan. Lê vê carê ev lîstik bi ser neketibû. Roberts rast digot. Rîvera destûra tirsê neda. Bi rastî jî di Rîvera de, tu asab–masab tunebû. Rîvera li gor kesên ku di emrê wî de bûn, ziravtir û zeîftir bû. Ev atmosfera ku di destpêkê de mirov têk dibe, qet tu tesîr lê ne kir. Alîkarên wî biyanî bûn. Ew, kes in ku ji tu tiştekî re nedibûn û ne hêja bûn

pênc pera. Ew rebenên rîngê yên bêheysiyet û bêenerjî bûn. Quncika wan, quncika wendakirinê bû. Di vî warî de tu şikek wanî piçûk jî tunebû.

Spider Hagerty bala Rîvera kişand û got:

– Divê tu bi dîqet be.

Spider serekalîkarê wî bû.

– Heta ku ji te bê, maçê dirêj bike... Kelly dixwaze ku tu weha bikî. Ger tu weha nekî, rojname dê bibêjin, ev maç, maçeke ku berê li ser hatiye li hevkirin e. Bi vî awayî, li hemû Los Angelesê dê sempatiya ku ji bo vê sporê heye, kêm bibe.

Ev gotin, gotinên hêvî şikenandinê bûn. Lê Rîvera qet guh nedida van gotinan. Wî ji hemû maçên boksê yên ku ji bo xatirê pereyan çêdibin, hertim nefret dikir. Ji bo ku ji birçîna nemire, ketibû vî karî. Ew li lokalên meşqkirinê, bûbû qurmê derban yên ku mirov pê meşqê dike. Laşê wî ji bo boksê, mukemmel bû. Lê wî bala xwe nedida vêya jî. Her çi dibe, bila bibe, wî ji boksê nefret dikir. Beriya ku ew têkeve nav Juntayê, ji bo xatirê pereyan boks dikir û wî dizanîbû ku mirov di vî meslekî de, pirr rehet pera qezenc dike. Û ew, ne ew kesê yekem bû ku di vî meslekê ku jê nefret dikir de, bi ser diket. Wî guhneda hîsên xwe. Her çi diba, bila biba, diviyabû ev maça qezenc bikira. Netîceya maçê divê ne bi awayekî din ba. Li pişta wî, hêzên mezin yên ku ev qelebalixa ku li vê derê ye, tu carî nikare xeyal bike, hebûn. Sebeba vê baweriyê jî ev hêz bû. Danny Ward ji bo pereyan û ji bo jiyaneke xweş ya ku bi rêya pereyan tê, şer dikir. Lê tiştê ku Rîveta ji bo wê şer dikir, ew tiştê ku di mejiyê wî dikeliya, bû. Dema ku ew tenê li quncika xwe rûniştibû û li bende raqîbê xwe bû, hemû tiştên ku wî diajot ser şer, di ber çavên wî yên wek bizotên êgir re derbas dibûn. Wî ew fabrîkeyên li Rio Blanca yên ku dîwarên wan spîkirî û bi quwweta avê dixebitîn, anî ber çavên xwe. Wî şeş hezar karkerên birçî û rengavêtî û zarokên piçûk yên heft–heyşt salî ku ji bo di rojê de deh Senta bistîne, xwe diperitandin, didît. Wî ew kesên ku di boyaxaneyan de, emrê xwe

dirizandin, ew cenazena didîtin. Hat bîra wî ku bavê wî, navê wan boyexanan kiribû "şikeftên întîxarê". Li wê derê salekê mayin, dihat maneya mirinê. Dû re, malên wan yên ku weke qutiyan bûn û dema tev wê jî ku diya wî wext didît û pê şa dibû, bi bîr anî. Û bavê wî hat ber çavê wî; bi sîngeke fireh û mezin, bi boqê simbêlan û ji herkesî qenctir û delaltir. Dilê wî ewqas fireh bû ku ew hezkirina ku di dilê wî de hilnedihat hem têra diya wî dikir û hem jî têra Muchachoyê piçûk yê ku li kêlekekê dileyizt dikir. Wê demê navê wî ne Felipe Rîvera bû. Navê wî ji ber navê dê û bavê, Fernandez bû. Wan bi navê Juan bangî wî dikirin. Dû re, dema dît ku komîserê polîsan ji navê Fernandez nefret dike, wî bi xwe navê xwe guhert. Hey Joaquin Fernandezê mezin û dilovan! Wî di bîranînên Rîwera de cîhekî mezin digirt. Wê gavê hişê wî baş nedigihaştê û fehm nedikir. Lê nuha, dema ku ew li derbasbûnê fikirî, fahm dikir. Bavê wî hat ber çavên wî; li wê matbaeya piçûk herf dixistin rêzê an jî li ser maseya ku tiştên li ser wê tevlihev, nivîsên ku dawiya wan qet nedihat, dinivîsand. Wî karkerên ku di tariya şevê de, mirov di got qey sûc kirine bi dizî dihatin mala wan û bi bavê wî re diketin nava munaqeşeyên dûr û dirêj, bi bîr anî. Û wê gavê Muchachoyê ku li qoziyê radiza jî hertim ne di xew de bû. Bi dengê Spider Hagerty ji xeyalan şiyar bû.

Hagerty:

– Hema tu bi carekê xwe li erdê rast neke û maxlûb nebe ha. Talîmat weha ye, lêxistina xwe bixwe û pereyên xwe bistîne.

Deh deqîqe derbas bûbûn û Rîvera hîn jî li qoziya xwe rûniştîbû. Danny li ortê nexuyabû. Xuyabû ku dê hîleya xwe bi qasî ku bikariba dirêj bikira. Di vê navbeynê de, hinek xeyalên din hatin ber çavên Rîvera. Lokavta ku ji ber greva ji bo piştgiriya katkerên ku li Pueblayê di grevê de bûn, li hember karkerên ji Rio Blancoyê dihat bikar anîn... Birçîbûn... Ew gîha û kokên nebatan yên ku ji serê çiyan berhev dikirin û dixwarin û herkes pê nexweş diket...Dû re ew kabûsa... Ew saha vala ya ku li ber ambarên şîrketê, karkerên birçî

yên ku hejmara wan digihaşt hezaran û leşkerên Porfirio Dîaz... Ew agirê ku ji tivingên kesên ku dixwest greva piştgiriyê ya karkeran bi xwînê bifetisîne, derdiket û mirin vedirşiya... Û ew şeva hanê!.. Vagonên berê xwe dabûn Vera-Cruzayê heta ber dev bi termên ku dê ji segmasiyan re bibin adan dagirtî... Derketina wî ya ser terman û di nav wan termên ku mûyên laşê mirov gij dikirin de, li dê û bavê xwe gerîn û dîtina wan wek îro dihat bîra wî... Tew dîya wî pirr baş dihat bîra wî... Laşê wê di bin termên din de wenda bûbû, çûbû. Bi tenê rûyê wê xuya dibû. Dema ku tivingên firotî yên Porfirio Dîaz dîsa dest bi gulebaranê kiribûn, wî xwe dîsa avêtibû erdê û wek çûkê ku ketibû feqê terpilîbû û ji wir bi dûr ketibû. Dengekî ecêb wek dengê pêlên deryayê hat guhên wî. Bi dû wê re, di nav keriyek alîkar de, Danny ward xuya bû. Hemû kesên ku di salonê de bûn, ji bo qehramanê navdar yê ku serkevtina wî ji nuha de xuyabû, li çepikan dixistin. Herkesî navê wî bang dikir û herkesî piştgiriya wî dikir. wekî din jî dema ku Danny di nav benan re bi fiyaqe derbas bû û derket rîngê, devên alîkarên Rîvera jî ji hev mabûn. Kenekî pirr comert xwe bera ser rûyê Danny dabû. Dema ku Danny dikeniya, hemû rûyê wî, heta hundurê çavên wî jî dikeniyan. Divê boksor weha bin! Qenciya wî, hîsên wî yên dostaniyê ji çavên wî dihatin xwendin. Kesê ku nas nedikir, tunebû. Esprî belav dikir, haqehaqa wî bû û di nav benan de silav dida hevalên xwe.

Temaşevanên ku li dûr rûniştibûn, ji ber heyranbûna xwe, heta deng di wan de hebû, bang dikirin:

– Danny, şêr Danny!

Ev merasîma nîşandana hezkirinê, tam pênc deqîqeyan ajot. Tu kesî Rîvera zilam nedihesiband û eleqê nîşan nedida. Di çavên temaşevanan de, hebûn û tunebûna wî wek hev bû.

Spider Hagerty rûyê xwe yê qermîçokî nêzîkî yê Rîvera kir û got:

– Li min binihere, divê tu ne tirse û divê talîmat ji bîra te neçin. Divê tu îdare bike. Weha zû bi zû mexlûbiyet nabe. Yan na, divê tu zanibe ku me ji bo lêxistina te ya li odeya kincguhertinê, emir sten-

diye. Tu fahm dikî? Divê tu di ber xwe de bidî.

Temaşevanan dest bi çepikan kirin. Danny xwe ber bi cîhê ku ew lê rûniştibû hat, xwe daqûl kir, destê Rîvera yê rastê xist nav destên xwe û bi awayekî dostanî guvaşt. Bi devlikeniya xwe di ber bêvila wî de sekinîbû. Temaşevanan ji bo vê reftariya Danny ya wek numûneyeke sportmeniyê dihate dîtin, heta ji wan dihat li çepikan xistin. Danny mîna birayekî, silav li raqîbê xwe dikir. Lêvên Danny liviya û temaşevanan ev mîna nîşana şanseke qenc hesibandin û bi awayekî ji xwe derbasbûyî, ji nû ve li çepikan xistin. Rîvera bi tenê van peyvên ku hêdî hêdî û bi dizî dihatin gotin, dibihîst.

Ji nava lêvên Danny bi bişirandineke ji dil ev peyv hatibû gotin:

– Meksîkiyê piçûk, kûçikê heram! Ez dê te bikujim!

Rîvera tev ne liviya. Ji cîhê xwe jî ranebû. Hew bi çapên tije nefret lê niherî. Wê gavê miroveki di nav benan de bang kir û got:

– Rabe ser xwe, ker lawê kera!

Temaşevan ji ber vê hereketa ku bi sportmeniyê re li hevdû nake, qeherîn û bi hev re ew protesto kirin. Lê ew tev neliviya û li quncika xwe rûniştî ma. Dema ku Danny ber bi quncika xwe zîvirî, temaşevanan dîsa li çepikan xistin. Gava Danny xwe tazî kir, vin vineke heyraniyê bilind bû. Laşê wî zirav û xurt xuya dikir. rengê çermê wî mîna yê jinan spîboz û şayik bû. Sûretên wî hertim di kovarên sporê de derdiketin. Dema ku Spider Hagerty vezelê Rîvera jê kir, temaşevan xeyal şikestî bûbûn û nerazîbûna wan dihate bihîstin. Ji ber qemerbûna wî, laşê wî zuha xuya dibû. Halbûkî laşê wî bi adaleyan ve hatibû xemilandin, lê ev bi qasî yên raqîbê wî tesîr nekiribûn. Lê ew tiştê ku ji bala temaşevanan nekişandibû, firehbûna sînga wî bû. Ne sertbûna goştê wî, ne jî ew sîstema tenik ya asaban ku mîna torekê xwe li laşê wî gerandibû, bala tu kesî dikşand. Ew di çavên temaşevanan de, mîna xortekî hîjdehsalî ku laşê wî dişibiya yê zarokekî piçûk dihate xuyakirin. Ma qey Danny weha bû! Danny 24 salî bû û laşê wî, laşê zilama bû. Gava ku wan li orta rîngê li tembîhên hakim yên talî guhdar dikirin, ev ferq bêtir xuya di-

bû. Çavên Rîvera ji nişka ve bi Roberts ket. Li paşiya rojnamevanan rûniştîbû. Îro ji her wextê serxweştir bû. Ji ber serxweşiya wî, zimanê wî jî giran bûbû.

Roberts digot:

– Guh medê Rîvera, vêya ji aqilê xwe dernexe, ew nikare te bikuje. Ew dê di destpêkê de ji nişka ve û bêplan li te bide, lê divê tu şaş mebe. Têkeve parastinê û wext derbas bike. Ew nikare zerareke mezin bide te. Weha bihesibîne ku tu antremanê dike.

Rîvera tu reaksiyon nîşan neda û ji ber vê jî mirov nizanîbû bê deng çûyê an na.

Roberts li zilamê kêleka xwe zîvirî û kir pise pis:

– Ax, tu nizanî bê ew çi şeytanekî bêdeng e. Ew hertim weha ye.

Nefrera di çavên Rîverayî de wenda bûbû. Şiklên tivingên bêhejmar dibiriqandin. Her rûyê ku di salonê de xuya dibû, bûbû tivingek. Çavên wî ji deverên Meksîkayê yên nêzî sînor û şoreşgerên ku di nava kincên riziyayî de ne pê ve, tu tiştekî din ne didît. Li quncika xwe dipa. Alîkarên wî rahiştin kursiya ku vedibe û dikeve tev û di nava benan re derketin derveyî rîngê. Danny li hember wî bû. Gongê lêxist. Maçê dest pê kir. Temaşevanan bi kêf bang kirin. Maçeke weha ku baweriya mirov tîne, hîn neharibû dîtin. Rojnameyan rast digotin. Ev maçeke heyfstendinê bû. Danny bi xweçengkirina yekem ve, ji çaran sisiyê wê mesafeya dûr ya ku di nava wî Rîvera de hebû, girt û xwe avêt ser raqîbê xwe. Ev jî dida nîşan dan ku bê Danny çawa dixwaze yê Meksîkî bieciqîne. Ne yek, ne deh, hutukên bêhejmar lêdixistin. Tofana hutukan rabûbû. Rîvera di nava van hutukên bêhejmar de wenda bûbû. Ew di bin pêlên hutukên boksorê ku hosteyê karê xwe û ku di her pozîsyonê de hutuk diavêtin de mabû, çûbû. Di bin vê giraniyê de eciqîbû, li benan diket. Gava hakem wî ber bi orta rîngê ve dianî, ew car din ber bi benan ve dihat çengkirin. Ev nedişibihiya maçeke boksê. Ev cînayet bi xwe bû, cenawertî bû. Danny tiştê ku dikare bike, bi awayekî wehşî îspat dikir. Kêf û heyecana temaşevanan gihaştibû bandevê. Ji

ber vê jî wan ferq nedikir ku lawikê Meksîkî hîn jî li ser piya mabû. Lêwik xwe li ber derbên Danny yên ku mirov gêj dikir, nikarîbû bigirta û mirov digot qey ew yekcar li ortê nexuya bû. Ev rewş du-sê deqîqeyan weha dom kir. Dema ku ew ji hev veqetiyan, yê Meksîkî hat dîtin. Lêva wî çiriyayî bû û xwîn ji bêvilê dihat. Deverên pişta wî yên ku li benan ketibûn mîna rêyên tije xwîn xuya dikirin. Sînga wî mîna kûrikê ranedibû û danediket û çavên wî jî wek hertim mîna agirê sar diçûrisandin, lê çi feyde, wan ev ferq nedikirin. Wî di antremanan de gelek şampiyonên har dîtibû. Ma hindik caran bûbû hedefa êrîşên wan î bêaman! Ew li hember van derban, ji car bi nîv dollarê û heta di hefteyekê de panzdeh dollaran, fêrî tehamulkirinê bûbû. Wî di wê dibistana bêaman de, xwendineke pirr zor kiribû. Ji nişka ve, tiştekî ku tu kes ne li bendê bû, qewimî. Ew tofana ku mirov gêj dikir, bi carekê rawestiya. Rîveta li ser piya û bi tena serê xwe bû. Danny, ew Dannyê mezin li ser piştê, li erdê hatibû rast kirin. Dema ku hişê wî dihate serê wî, laşê wî kil dibû. Ew ne kil bûbû, ne lingên wî li hev geriyabû, ne jî hêdî hêdî ketibû. Hutuka Rîvera ya rastê wek derba mirinê ji nişka ve lê ketibû û ew li wir rast kiribû. Hakem Rîvera bi paş de daf da, li ser qehramanê ketî sekinî û dest bi jimartina saniyeyan kir. Ji kê bihata bila bihata, lê temaşevanan ji bo hutukên weha ku mirov dixistin xwarê, li çepikan dixistin. Lê nuha herkes bêdeng mabû. Kes ne li bende tiştekî weha bû. Bûyerê herkes şaş kiribû. Herkesî bi bêdengiyeke asabî, li dengê jimartina saniyeyan guhdar kirin.

Dengê Roberts bêdengiya ku xwe bera ser wê deverê dabû, belav kir:

– Ma min ji we re negotibû ku ew bi herdu hutukên xwe dikare boksê bike?

Di saniyeya pêncan de, Danny xwe bi ser zik ve qeliband û di ya heftan de, li ser çongên xwe sekinî. Di navbera saniyeya nehan û dehan de jî ji bo rabûna ser piyan amade bû. Ger dema saniyeya dehan bihata jimartin jî çongên wî li erdê bimaya, wê gavê ew dê

mexlûb bihata hesibandin. Ger heta dehan, çongên wî ji erdê rabûbe, ew li ser lingan rawestiyayî tê qebûlkirin û wê gavê mafê Rîvera hebû ku ji bo wî li erdê rast bike, ji nû ve hutukan lê bixe. Dema ku wî çongê xwe rakira, Rîvera dê bi ser çavan de vekira. Ji ber vê, ew li dora xwe dizîvirî. Mirov gava bala xwe didayê, didît ku hakim jî bi wî re dizîvire. Dema hakim saniye dijmartin, hêdî hêdî hereket dikir. Rîvera vêya ferq dikir. Hemû biyanî li hember wî bûn, heta hakim bi xwe jî. Hakim, bi jimartina nehan re dehfek da Rîvera. Ev neheqiyek bû. Lê ev neheqî têra ku Danny bi bişirandinekê rabe ser piyan kiribû. Bi milên xwe zik, çav û rûyên xwe girt û xwe li Rîvera gerand. Li gor qaîdeyên lîstikê, diviyabû hakim wan ji hevdû veqetanda, lê mêrik çavên xwe ji vê re girt. Danny jî mîna mîdyeya ku xwe hişk bi karîna(gemi omurgasi, geminin su içinde kalan bolumu) keştiyê ve girtibe, Rîvera zevt kiribû û bernedida. Ji ber vê jî bi qasî ku bi ser xwe de were, zeman peyde kiribû. Ger ew heta dawiya vê raundê, li ser lingan bisekiniya, wê gavê dê bikarîba di quncika xwe de tam deqîqeyekê îstirahat bikira. Û weha jî bû. Tev dijwarî û bêhêvîtiya ku li holê bû jî ew dîsa dibişirî.

Temaşevanekî weha bang kir:

– Ew dîsa mîna berê bi kêf xuya dike!

Temaşevanan xwe bi vê tesellî kirin û awayê xwe yê berê domandin.

Gava Danny hat quncika xwe, ji alîkarên xwe re bi hêrs got:

– Hutukê evê Meksîkî mîna xezeba xwedê ye!

Tu ta'ma raunda duyem û sêyem jî tunebû. Danny xwe pêş de diavê, direve, bi wî digre, xwe diparêze û bi vî awayî dixwest gêjbûna ji ber hutuka raunda yekem de ya ku wî tevizandibû, ji ser xwe biavêje. Ya rastî ew bi wê huyukê gêj bûbû, lê ji ber ku di forma xwe de bû, dîsa bi ser hişê xwe de hatibû. Lê wî êdî nema dikarîbû wê taktîka xwe ya wehşî bi kar bianiya. Wî êdî dizanîbû bê evê Meksîkî çi xurt û jêhatî ye. Wî nuha hemû şiyan û zanebûna xwe ya di warê boksê de bi kar dianî. Di hemû lîstikên xwe de hoste bû.

Tu hutukê xurt nikarîbû biavêta, lê dîsa jî wî bi saya teknîka xwe, raqîbê xwe gêj dikir û dibetiland. Gava Rîvera hutukek diavêtê, wî sê hutuk diavêtê, lê ev ne hutukin bi tesîr bûn. Tesîra hutukên wî ne ji ber xurtbûna wan, lê ji ber pirrbûna hejmara wan dihat. Wî hurmeta vî zarokê ku herdu hutukên xwe bi hostetiyeke mezin bi kar dianî, digirt. Rîvera di parastinê de, dest bikaranîna hutuka xwe ya çepê kir. Gava xwe li hember êrîşan diparast, hutukên wî yên çepê li ser hev li dev û bêvila Danny diketin. Lê Danny dikarîbû di gelek stîlan de şer bikira û ya rastî jî ji ber vê ji bo şampiyontiyê mîna namzet dihat destnîşan kirin. Di boksê de dikarîbû bi rehetî ji stîlekê derbasî ya din bûbûya. Wî nuha jî dest bi stîla ji hundur kiribû. Ew di vê stîlê de gelek bi serkevtî bû. Bi awayî hutukên ku ji aliyê çepê dihatin jî diparast. Gava ku wî hutuka xwe ji binî de ber bi jor ve avêt û yê Meksîkî li erdê xist, temaşevanan wextî govend bigirtana. Rîvera xwe da ser çongeke xwe û li bende hejmartina saniyeyan ma. Wî ferq kir ku bê hakim çawa bi lez dihejmêre. Danny di raunda heftan de, ew aparkuta xwe ya meşhûr dîsa lê xist. Rîvera bi tenê hebekî kil bû, lê di wê esnayê de Danny ew bi derbekê di nav benan re avêt derve. Rîvera bi ser serê xwe ve ket ser rojnamevanan. Mêrikan jê re bûn alîkar û ew hilkişandin heta ber benan. Dema hakim dihejmart, wî jî xwe dabû ser çongeke xwe û îstirahat dikir. Ji bo ketina rîngê, divê ew di nav benan re derbas bûbûya. Danny jî ji xwedê ev dixwest. Hakim xwe tev lê nedikir, tew ji bo paşdevekşandinê Danny îkaz jî nedikir.

Hişê temaşevanan ji serê wan çûbû û heta ji wan dihat bang dikirin:

– Wî bikuje, Danny! Danny, wî bikuje!

Tiştê ku ji destê Danny dihat, texsîr nedikir, lê Rîvera ne di saniyeya nehan de, di ya heyştan de ji nişka ve xwe di nav benan re rakir û ket rîngê. Danny û ew hatin hember hevdû. Wê gavê hakim ket orta wan û mîna hakimekî alîgir, hemû rehetiyên ku ji bo Danny diviyabû peyde kir û Rîvera bi paş de kişand. Halbûkî gava

cîh li Danny teng bûbû, raqîbê xwe zevt kiribû û bernedabû, wê gavê hakim wan ji hev jî nekiribû. Rîvera heta dawiya vê raundê îdare kir. Pişt re hişê wî hat serê wî û ber çavên wî ronî bû. Hemû wek hevdû bûn; hemû, biyaniyên ku bi nefretê dagirtî bûn. Di warê neheqiyê de tu ferq di navbera wan de tunebû. Di vê dema mirin û mayinê de, hinek tişt dihatin ber çavên wî: Rêhesina ku di nava çolê re derbas dibû, polîsên Meksîkî û Amerîkî, girtîgeh û gelê ku di nav kincên qetiyayî de... Manzarayên jiyana piştî greva "Rio Blanco"yê ya ku nefreta mirov zêdetir dike û dilê mirov dişewitîne... Dû re wî dît ku bê bahoza şoreşa sor ya biheysiyet çawa van manzaranan ji welatên wî paqij dike. Sîleh li hember wî bûn. Her rûyekî ku wî jê nefret dikir, sîlehek bû. Wî ji bo xatirê sîlehan şer dikir. Ew bi sîlehan re bûbû yek. Ew şoreş bi xwe bû. Wî ji bo hemû Meksîkayê şer dikir. Temaşevan ji Rîvera hêrs bûbûn. Ji bo çi wî ew lêdana ku heq kiribû, nedixwar? Wî wek navê xwe dizanîbû ku ew ê vê maçê wenda bike! Ji bo çi weha li ber xwe dida? Temaşevanên ku meyila wan li ser Rîvera bûn, gelekî hindik bûn. Ew jî wan temaşevanên ku pişta xwe bi şensa xwe ya şertlîstinê ve girêdabûn, bûn. Wan teva baş bawer dikirin ku Danny dê bi serkeve, lê dîsa jî li ser yê Meksîkî bi awayê li hember yekê sisê û li hember çaran jî deh, pere razandibûn. Hetta yên ku li ser bê Rîvera dê di raunda çendan de naqawt bibe, bi şert lîstibûn jî hebûn. Pereyên ku li dora rîngê diçû û dihat, nedihat hesibandin. Yên ku digotin, Rîvera dê nikaribe heta raunda hefran îdare bike, hebûn. Ew kesên ku ji şertlîstinê bi qezenc derdiketin, nuha jî pişta xwe didan kursiyên xwe û bi heyecan beşdarî nava wan kesên ku ji bo Danny diqîriyan. Rîvera destûra mexlûbiyetê nedida. Raqîbê wî di raunda heyştan de, ji bo aparkutekê lê bide, belasebeb li valabûnekê geriya. Rîvera di raunda nehan de, weha kir ku devê temaşevanan dîsa ji hev vebû. Di dema ku ew nêzîkî hevdû bûbûn de, Rîvera ji nişka ve xwe jê xelas kir û di wê mesafeya ku bi qasî bihustekê de, hutuka xwe ji jêr ber bi jor ve avêtê. Danny got "gurrm" û ket erdê. Li bende hej-

martina saniyeyan ma. Devê temaşevanan bihustekê vekirî mabû. Danny bi sîleha xwe derb xwaribû. Ew aparkuta wî ya rastê ya mîna destanekê di devê xelkê de, nuha li hember wî hatibû bikaranîn. Gava ku neh hat hejmartin û Danny rabû ser xwe, Rîvera ber bi wî çû, lû hakim ket orta wan û nehişt tu hutuka lê bide. Halbûkî gava ji berdêla Danny Rîvera diket erdê, hakim rêya Danny qet nedibirrî. Rîvera di raunda dehan de, du carên din jî erd bi raqîbê xwe da maçîkirin. Danny dîn bûbû. Lê bêî ku dev ji bişirandina xwe berde, dîsa dest êrîşên xwe yên wehşî yên ku di destpêka maçê de kiribû, kir. Lê her çi dibû, bila bûbûya, wî tev li wan hutukên ku li ser hev dihat avêtin jî nikarîbû Rîvera kil bikira. Halbukî Rîvera di nava vê bahozê de tam sê caran erd pê dabû maçîkirin. Danny êdî nema dikarîbû bi ser xwe ve bihata. Di raunda yanzdehan de, bi temamî perîşan bûbû, heta raunda çardehan jî hemû şiyana xwe ya di vî meslekî de peyde bûbû, bi kar anîbû; ber bi pêş ve diçe, paş ve vedikişe, dest bi parastinê dike û şer dike û direve û bi vî awayî dixwaze quweta xwe paş de bîne. Ji aliyê din ve jî bi metodên fenek yên boksorekî bi tecrube, bi faul şer dikir. Wî hemû fenê ku dizanîbû, bi kar anî; mîna xwe tesaduf e, Rîvera zevt dikir, lepikên wî dixist bin çengên xwe û bernedida û ji bo bîhna Rîvera biçikîne, lepikên xwe dida ser devê wî. Dema ku xwe li Rîvera digerand, di guhê wî de sixêfê nemayî dikir. Herkes, lê bi rastî herkes, hem hakim û hem jî temaşevanan hêla Danny digirtin, herkesî ji bo ku ew qezenc bike, xwe perçe dikirin. Wan dizanîbû bê Danny li çi difikirî; ew li benda wê dema ku dê bi hemû taqata xwe hutukek li Rîvera xista, bû.Danny vekirî şer dikir, paş ve vedikişiya, wî teşwîqî ser xwe dikir û li firseta ku wî ji xafil de bigre û lê bide digeriya. Wê gavê wî dê heta quwet tê de heba hutukek lê bidaya û maç biqedanda. Piştî vê hutukê gelek rehet bû, wî dê mîna her boksorê mezin, berê bi hutuka xwe ya rastê li zikê wî xista, dû re çenga wî û diqediya diçû... Heta ku ew li ser piya bimîne, dikare vê bike, ji ber ku wî bi quwera milên xwe ve nav dabû. Di navbera raundan de, alîkarên Rîvera

qet alîkariya wî nedikirin. Ew peşkîrên ku wan li ber wî kil dikirin, ew qet hênik nedikirin. Spider Hagerty xwedêgiravî aqil dida wî, lê Rîvera wek navê xwe dizanîbû ku ev taktîk şaş in. Herkes li dij wî bûn. Wî di raunda çardehan de Danny dîsa li erdê rast kir. Hakim dest bi hejmara saniyeyan kiribû û Rîvera jî paş ve vekîşîyabû û milên xwe bera ber xwe dabû û îstirahat dikir. Pis–pisên li qoziya wî alî ji çavçn wî nedireviyan. Wî dît ku Michael Kelly çû ba Roberts û di guhê wî de kir pis pis. Rîvera li çolê mezin bûbû û guhê wî bi qasî yê pisîkekê hesas bû. Ji ber vê yekê jî wî hinek ji axaftina wan bihîstibû. Wî dixwest hemû axaftinên wan bibihîse, ji ber vê jî dema raqîbî wî rabû ser piyan, wî heta ber benan ajot.

Michael digot:

– Biçe ba wî!

Roberts di maneya erê de serê xwe kil dikir.

– Jê re bibêje ku çi dibe bila bibe, lê divê Danny vê maçê qezenc bike. Min hebû malê xwe xistiye ortê. Ger ev mesele di raunda panzdehan de neqede, ez mahf dibim. Ev lawik li peyva te guhdarî dike. Biçe ba wî û jê re tiştekî bibêje.

Wê gavê Rîvera fahm kir ku ev mesele pirr ciddî ye û herkes ji bo têkçûna wî dixebite. Wî Danny careke din li erdê rast kir. Milên xwe bera ber xwe da û li bende rabûna wî ma.

Tam di wê esnayê de Roberts bang kir:

– Biçe quncika xwe! Êdî heta dehan, nema ji cîhê xwe radibe.

Ew mîna ku di antremanan de emir dide, dipeyivî. Lê Rîvera bi çavên tijenefret lênihêrî û dû re xwe da benda rabûna Danny. Piştî raundê, dema ku Rîvera çû quncika xwe, Kelly xwe gîhand ba wî û jê re got:

– Kuro kero, êdî bes e, xwe mexlûb bike! Rîvera divê tu mexlûb bibî. Ger tu bi ya min bikî, ez ê te di nava pereyan de dakim. Ez ê careke din bihêlim ku tu zora Danny bibî. Lê ka nuha were bi ya min bike û êdî xwe mexlûb bike!

Ji çavên Rîvera dixuyabû ku wî ev gotin bihîstibû, lê tu îşaretên

ku qebûl dike an nake, nedabû.

Kelly bi hêrs jê pirsî:

– Tu ji bo çi tiştekî nabêjî?

Spider xwe avêt ortê û got:

– Tu qûna xwe biqetîne jî dê zora te biçe. Tu çi dike, bike, lê hakim di dawiyê de weha bike ku tu dê mexlûb bibe. Ger tu guhê xwe bide Kelly, wê ji bo te baş be.

Kelly li ber wî geriya:

– Ez qurbana te bim, tê xwe mexlûb bike! Ji bo ku tu bibî şampiyon, çi ji destên bê, ez ê bikim.

Tu peyv ji Rîvera çênebû, lê bi tenê weha got:

– Soza min soz e. Ger min got, ez ê bikim, ez dikim.

Dengê gongê hat. Rîvera bîhna talûkeyekê stendibû. Temaşevan bi lîstika ku dihat gerandin, neesiyabûn.Rîvera pê nizanîbû bê talûkeyeke çawa ye, lê wî nuha talûkeyek di rîngê de, li ber bêvila xwe hîs dikir. Weha xuyabû ku baweriya Danny ya di destpêka maçê de bi şûn de hatibû. Cesareta wî ya ku xwe bi pêş de diavêt, Rîvera xiste nava endîşeeykê. Dolabin dizîvirîn. Danny êrîşî Rîvera kir, lê Rîvera xwe jê xelas kir û xwe da kêlekê. Xuya bû ku raqîbê wî dixwest xwe nêzîkî bike û şer bike. Ji bo hîleya ku dihat fikirandin, qey pêwîstî bi rewşeke weha hebû. Rîvera xwe paş de vekîşand û li rîngê çû û hat. Lê wî dizanîbû ku çi bikira bila bikira, di dawiyê de wê muheqeq bihatana nêzîkî hevdû û ew hîle dê bihata kirin. Gava Danny êrîşî wî kir, wî weha da xuya kirin ku sînga wan dike bigihêje hevdû, lê tam di dema ku sînga wan hat hember hev, Rîvera ji nişka ve paş de vekişiya. Di wê demê de, ji quncika Danny dengê "faul"ê hat. Hakim nema dizanîbû bê wê çawa bikira. Biryara ku diviyabû bida, di nava lêvên wî yên ku diricifîn de ma.

Wê gavê lawikekî ji balkonê bang kir:

– Faula ecemiyan!

Bi ser vê de, Danny berê xwe da Rîvera û dest bi sixêfên pirr pîs kir. Rîvera êdî biryara xwe dabû ku ew ê nema ji nêzîk ve şer bike.

Bi vî awayî şensa xwe dadixist nêvî, lê wî ev jî pirr baş dizanîbû ku serkevtin bi wê hutuka ku dê meselê bi temamî tayin bike ve girêdayî bû. Wan dê ew di firseta yekem de, ji ber sûcê li dij qaîdeyan dîskvalîfîye bikirana û ev mesele biqedandana. Danny êdî bê hesab êrîş dikir. Wî di du raundan de beta dû Meksîkîyê ku nedihişt ew xwe nêzîkî wî bike, da. Rîvera hutuk li ser hutukan xwar. Ji bo ku xwe nexe talûkeyê, li hember hemû derban îdare kir. Ev rewşa talî, hişê temaşevanên ku piştgiriya Danny digirtin ji serê wan biribû; di cîhê xwe de nedisekinîn. Wan tu ma'ne nedidan vê rewşê. Boksorê ku taca serê wan bû, tu nemabû ku maçê bi serkevtinê biqedîne. Bi nefret bi ser Rîvera de diqîriyan:

– Tu ji bo çi şer nakî û direvî? Tirsonekê heram! Tu jî lê bide, kûçik! Li wî bide Danny, wî bikuje!

Di wê salona mezin de, yê ku neketibû heyecanê, Rîvera bi tenê bû. Tiştê xerîb ev bû ku ew mirovekî ji van kesên ku li vê derê ne bêtir dikeliya û ya din jî ew ji bûbû şahidê heyecanên ku ji hêrsa kollektîv ya vî deh hezarê li vê derê mezintir. Ji ber wê, ev heyecan û germî, mîna hênikayiyeke êvareke havînî bû. Danny heta raunda hivdehan jî bi qurbanê xwe lîst. Carekê Rîvera bi tesîta hutukekê kil bû û dema ku dikira li ser piştê biketa, milên xwe bera ber xwe da. Danny got qey firseta ku ew lê digeriya, bi dest wî ket. Êdî yê Meksîkî û wîcdanê Danny. Lê Rîvera bi vê numarayê ew xapand û ji nişka ve hutukek li orta devê Danny xist. Lingên Danny ji erdê qut bû. Gava ku rabû ser piyan, hutukeke necêb li çeng û stuyê wî ket. Rîvera ev lêdan sê caran li ser hev tekrar kir. Her çi dibe, bila bibe, lê ne mumkun bû ku mirov bigota, ev hutukanan li dijî qaîdeyan e.

Kelly li hakim nihêrî û awakî bêçare naliya:

– Ax, Bill! Bill!

Hakim bi xemgînî bersiv da:

– Ez çi bikim, ew tu firsetê nade min.

Danny hewil dida ku rabe ser piyan. Menajerê wî nedixwest peş-

kîrê biavêje rîngê, lê Kelly û yên ku li kêlekê rûniştibûn, ji bo rawestandina maçê bang polîsan kirin. Rîvera dît ku komîserê zikmezin di nav benan re derbasî rîngê bû. Tu ma'ne neda vêya, got qey ev jî xayintiyek ji wan xayintiyên van biyaniyan bû. Danny li hember wî li ser piyan kil dibû. Tam gava ku hakim û komîser ji bo ji hevdûveqetandinê xwe bi hevdû re dirêjî Rîvera kirin, Rîvera jî derba talî li Danny xist. Êdî ne hewce bû ku mirov maç rawestanda. Danny li wê erdê weha rastkirî mabû.

Rîvera bi dengekî sar ji hakim re got:

– Bihejmêre!

Dema hejmartin qediya, alîkarên Danny ew hilgirtin û birin quncika wî.

Rîvera bi awakî ji xwe bawer, pirsî:

– Kê zora kê bir?

Hakim bê dilê xwe, bi destê wî girtû bilind kir. Tu kesî Rîvera pîroz nedikir. Dema ku ew ber bi quncika xwe ve çû, tu kesî neda pê wî. Alîkarên wî kursiya wî jî dananîbûn. Pişta xwe da benan û bi nefret li alîkarên xwe û li qelebalixa ku ji deh hezar biyaniyan pêk dihat, nihêrî. Taqat di çongên wî de nemabûn, ji ber betilbûnê digiriya. Gava ku ma'dê wî dixeliya(dilê wî li hev diket), sûretên dijminan di ber çavên wî re diçûn û dihatin. Dûre hat bîra wî ku ev tiving in. Tiving êdî yên wî bûn. Şoreş dikarîbû dest pê bikira.

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ❖ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ ◆ **Celadet Bedir-Xan** / Gramer
- ❖ DÊ Û DÊMARÎ ◆ **Egîdê Xudo** / Roman
- ❖ KESKESOR ◆ **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- ❖ DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN ◆ **Rohat** / Lêkolîn
- ❖ HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ ◆ **Mehmed Uzun** / Essay (Ceribandin)
- ❖ MÎRZA MEHEME ◆ **Medenî Ferho** / Roman
- ❖ MILKÊ EVÎNÊ ◆ **Rojen Barnas** / Siir
- ❖ ZAROKA SEVÊ ◆ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- ❖ BIYANÎ ◆ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Hesên** / Roman
- ❖ MÎRZAYÊ BIÇÛK ◆ **A. de Saint-Exupèri** Werger: **F. Husên** / Çîrok
- ❖ ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Amadekar: **X. Duhokî**
- ❖ RAMAN Û KULTUR ◆ **Şerefxan Cizîrî** / Essay (Ceribandin)
- ❖ ÇÎROKA ŞOFÊR ◆ **Cengîz Aytmatov** Werger: **Nacî Kutlay** / Roman
- ❖ ŞEVÊN SPÎ ◆ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ❖ MIŞK Û MIROV ◆ **John Steinbeck** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ❖ BEXÇEYÊ VÎŞNE ◆ **Çexov** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- ❖ LI BENDA GODOT ◆ **Samuel Beckett** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- ❖ GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforisma
- ❖ GIRTÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok
- ❖ KEVOKA SPÎ ◆ **Firat Cewerî** / Çîrok



**Jack London** di sala 1876'an de li San Fransiscoyê hatiye dinyayê. Zaroktiya wî di nava feqîrtiyê de, lê bi xebat û berxwedanê ve tijî derbas bûye. Ew cara pêşî di 17 saliya xwe de çîrokeke xwe belav dike û ew çîrok jî wî dikişîne cîhana nivîskariyê. Jê pê ve London bê westan dinivîsîne. Ew di temenekî çil salane de nêzîkî 50 pirtûkî dinivîsîne. Hinek ji pirtûkên wî yên naskirî ev in: "Pahniya Hesinî"1907, "Martin Eden" 1909, "Qêrîna Wahşetê" 1903, "Berî Adem" 1906, Şampiyon, Geliyê Heyvê, Berxwedan, Kûçikê Sîrkê û hwd.

Weşanxaneya me vê pirtûka ku berê du çîrokên wê "Xwêdana Eniyê" û "Yê Meksîkî" di kovara NÛDEMê de hatibûn weşandin, bi serbilindî pêşkêşî xwendevanên kurd dike.